Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1348 | 4-Sibat-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Bi êrişan dixwazin gelê Kurd qir bikin’

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Endamê Koma Cûdî Xalid Cûdî û rêveberê Navenda Koçerata a Çand û Hunerê Ferhan Qasim diyar kir ku armanca êrişên li ser Rojavayê Kurdistanê qirkirina gelê Kurd e û wiha gotin: “Dixwazin hebûna gelê Kurd ji holê rakin û destkeftiyên ku bi xwîna hezarê şehîdan hatiye avdan, tune bikin.”**

Bi planeke navneteweyî çeteyên hikumeta demkî li dijî Rojavayê Kurdistanê êrişên berfireh dane destpêkirin, armanca êrişan jî têkbirina destkeftiyên Şoreşa Rojava ye. Li hemberî van êrişên hov, gelê Kurd li her çar perîeyên Kurdistanê û tevahî seferber bû. Bi taybet li Rojavayê Kurdistanê gel bi tevahî çek hilgirtine û li kêleka şervanan parastina axa xwe dikin. Endamên çand û hunera Dicle li bajarê Dêrikê jî bi çek û sazên xwe berê xwe dan çeperên şer û li kêleka şervanan bûn.

Di derbarê tevlîbûna seferberiyê de banga seferberiyê û moralê gelê Kurd, endamên koma Cûdî Xalid Cûdî û Rêveberê navenda Koçerata a Çand û Hunerê Ferhan Qasim ji Rojnameya me re axivîn.



Xalid Cûdî



Ferhan Qasim

## Bi êrişan dixwazin gelê Kurd qir bikin

Endamê Koma Cûdî Xalid Cûdî anî ziman ku Rojavayê Kurdistanê di qonaxeke hesas re derbas dibe, hêzên dagirker bi riya çeteyên hikumeta demkî êrişên qirkirinê li ser gelê Kurd didin meşandin û wiha got: “Di van êrişên çeteyan de bajar û gundên Kurdan kirin armanc û komkujî pêk anîn. Ev êriş ji Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dest pêkir heya gihiştin Rojavayê Kurdistanê, armanca van êrişan berdewamkirina kompiloya li ser Rêber Apo ye, dixwazin hebûna gelê Kurd ji holê rakin û destkeftiyên ku bi xwîna hezarê şehîdan hatiye avdan tune bike. Raste me hinek herêm berdan lê ev nayê wê wateyê ku em şikestin, berûvajî wê me biryar da ku em xetên parastina xwe di alanên Kurdan çêbikin, da ku parastina şervanên xwe ji îxaneta derdorê bikin. Lewma Rêveberiya Xweser banga seferberiyê kir li her çar parçeyên Kurdistanê û li cîhanê. Em wek endamên Koma Cûdî li navenda Dicle a bajarê Dêrikê beşdarî vê seferberiyê bûn, me endmên xwe bi çek û rext kirin û derbasî alanên şer bûn. Herwiha hemû gelên Kurd ên li seranserî cîhanê bi vê bangê rabûn û dest bi çalakî û meşan kirin. Raste koma Cûdî komek hunerî ye, lê dema bê xwestin ji bo parastina axa xwe em ê çekê hilgirin û parastinê jî bikin.”

## ‘Pêwîst e her kes bi erkê xwe rabe’

Xalid Cûdî axaftinên xwe wiha qedand: “Dema pêwîst bike em ê bi saza, deng û bi çeka xwe berevaniyê di ber axa xwe de bikin. Li ser vî esasî em tevlî banga seferberiyê bûn me li bajarê Hesekê him çalakiyên hunerî him jî me cihê xwe di çeperên şer de girtin. Heya 10 rojan em li bajarê Hesekê man lê dema êriş zêde bûn û ber bi herêma Dêrikê ve çûn. Me berê xwe da bajarê Dêrikê û li wir careka din em ê ekîba xwe



kom bikin him bi hunera xwe ya şoreşgerî him jî bi çeka xwe em ê li kêlek keç û xortên xwe bin. Em wek gelê Kurd derbas ûna hikumeta demkî û dagirkeriya Tirk di herêmên xwe de naxwazin, niha jî gelek rûniştin çêdibin heger xwestekên gelê Kurd qebûl nekirin em ê li hember wan li berxwe bidin û şer bikin. Bangewaziya me taybet ji bo ciwan û hunermendan heye, ku ciwan bi rola xwe rabin û sînorên dagirkeriyê rakin û tevlî vê seferberiyê bibin. Herwiha hunermendên Kurd jî pêwîst e bi huner, saz û dengê xwe, rewşenbîr jî bi pênûs û lênûsa xwe bibin xwedî rol.”

## ‘Dawiya her berxwedaniyekê serkeftine’

Rêveberê Navenda Koçerata a Çand û Hunerê Ferhan Qasim jî da zanîn ku dema seferberî hat ragihandin ew wek endamên koma Cûdî û hunermendên şoreşê tevlî vê seferberiyê bûn û berê xwe dan bajarê Hesekê û wiha got: “Em nêzî 10 rojan bi moral, coş û cesaret li wir man û tevgeriyan, di destekî me de çek û di destê din de jî sazên hunerê bûn. Helwesta me û hemû gelê Rojava diyare ku em ne aşiqê şerin, berûvajî wê em gelekî azadî û aştî xwazin lê dema ku êriş û dagirkerî bixwazin derbasî bajarê me bibin. Helbet em bi hesanî tevnagerin û em ê heye dawiyê li berxwebidin û bi serbikevin jî. Gelê ku ev 15 salan li ser piyaye û bi hezaran şehîd da ji bo parastina maf û axa xwe, helbet wê helwesta me jî di van rojan de cûda be. Ji ber yekîtiya me hat avakirin û piştgirî ji bo me hat dayîn, ji bo vê yekê em ji gelê xwe yê ku ji derveyî welat re dibêjin qet ranewestin, rawestandin dijmin rehet dike, pêwîste em li qadan bin û ji helwesta xwe neyên xwar.  Em wek endamên Çand û hunerê dibêjin em li ser axa xwe ne û em ê li ser jiyan jî bikin, heya dilopek xwîn hebe em ê berxwedaniyê bikin û di dawiya her berxwedaniyekî de serkeftine.”

## FERHENGA BIWÊJAN

**Lingê wî di zikê wî de ye:**
- Nikare xwe tev bide; derfetên wî nînin; hatiye girêdan.

**Ma em dev li darê bikin?**
- Em bêhêz bûne; tiştek ji destê me nayê.

**Ma ez spiyên xwe bidimê?**
- Tiştekî min nîne bidimê.

**Rê li ber girt:**
- Êdî nikare sedemeke din nîşan bide; êdî gotina wî nema; êdî nikare nepejirîne; êdî behane di destê wî de neman.

**Riya çûkê nedayê:**
- Firseteke piçûk jî nedayê; nehişt bêhna xwe bistîne.

**Riya çûkê jê re nemaye:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER HEVALTIYÊ**

**Dûvikên wan bi hev ve girêdayî ne:**
- Her tim bi hev re ne; ji hev cuda nabin.

**Heta tu aş bî ez qeraş bim:**
- Heta tu min qebûl bikî ezê jî te qebûl bikim; heta tu hebî ezê li cem te bim.

**Peza kulek û bizina mûçek rastî hev hatin:**
- Yên weke hev dikarin hevaltiya hev bikin.

**Serê xwe dan hev:**
- Bi serê hev xistin; di hizir de bûn hevalên hev.

**LI SER LEWAZBÛNA BEDENÊ**

**Bistikek goşt li ser nîne:**
- Pir lewaz e; bêgoşt e.

**Bi tayekî xav tê xeniqandin:**
- Pir bêhêz û lewaz bûye; birçî û xizan bûye.

**Gepek koşt li ser nîne:**
- Pir lewaz e; bêgoşt e.
Hestî û post e.
- Bi heman wateyê.

**Maye çerm û hestî:**
- Ji bo kesê ji ber nexweşiyê pir lewaz bûyî tê gotin.

**Qijikek ji goştê wî têr naxwe:**
- Pir lewaz e; bêgoşt e.

**Qijik nikulê xwe lê bixe tiştek pê ve nayê:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman





## Jin li Îranê; Di navbera kiryarên girtin û darvekirinê



Xwepêşandanên gel li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ku di 28'ê Kanûna 2025'an de hatine destpêkirin bûye kirîza mirovahiyê, êdî cih di zîndanan de neman e. Di wan xwepêşandan de bi zanebûn jin kirine hedef û bi dehan jin bi guleyên dewletê jiyana xwe ji dest dane.**R-2**

## Hunermend û rojnamevanên Kurdistanî: Erka hunermendan ji bo Rojava erkeke mirovî û dîrokî ye

Hunermend Diyar Dêrsim, Şemdîn û rojnamevan Kakşar Oremar dan zanîn ku êrişa li ser Rojava komployek bû û gotin, “Erka hunermend û rewşenbîran ji bo Rojava erkek mirovî û dîrokî ye. Yekrêziya ku çêbû, destkefiyeke mezin e ji bo xwedîderketina şehîdan e. Koma Berxwedan wê ji bo Rojava xebata hunerî bike."**R-9**





Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1348 | 4-Sibat-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S



## ‘Ez dixwazim çarenûsa kurê min were eşkerekirin’

Dayika bi navê Cîhan Elî diyar kir ku di roja êrişên çeteyên hikumeta demkî di 18'ê Çileyê de kurê wê û hin hevalên wî yên şervan li Dêrazorê dîl ketin destê çeteyan de û wiha got: “Ez nizanim kurê min saxe yan jî şehîde. Roja ku agahî ji kurê min Rêwan hatiye qutkirin, ne roja min roj e, ne jî şeva min şev e."**R-3**

# JI BO PÊVAJO DEWAM BIKE, DIVÊ TIRKIYÊ GEF Û ÊRIŞAN RAWESTÎNE

Parlamenterê Wanê yê DEM Partiyê Mahmut Dindar diyar kir ku piştî şerê li ser Rojava dest pê kir, her tiştê girêdayî pêvajoyê di cihê xwe de rawestiyaye, ji bo wê jî da ku pêvajo dewam bike, pêwîst e mijara Rojava bê çareserkirin. Heger Tirkiyê bixwaze aştiyê ava bike, di serî de divê siyaseta dijberiyê li hember Rojava bidawî bike û ji axa Sûriyê derkeve.**R-4**







## Zêdetirî 7 hezar malbet ji koçberên Efrînê ji Tebqa û Reqayê koçber bûne

Bi êrişa hikumeta demkî li ser Tebqa û Reqayê zêdetirî 7 hazar malbet ji koçberên Efrînê ku li wir bi cih bibûn, berê xwe dan kantona Cizîrê û di dibistan, mizgeft û saziyan de dimînin.**R-7**



## Bikaranîna HTŞ û DAIŞ’ê di çarçoveya Rojhilata Navîn a nû de ye!

Ev geşedanên ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê re derbas dibin, hem jî êrişên ku HTŞ'ê bi piştgiriya dewleta Tirk li ser gelê Kurd dike, beşek ji lîstoka nexşerêya Rojhilata Navîn e. Di vê nexşerêya nû de HTŞ û DAIŞ'ê bûne lîstok ji bo gurkirina tevlîheviyê û pêkanîna berjewendiyên hêzên hegemon.**R-6**


Parastina Rojava, Parastina Kurdistanê ye — Farûk Sakik R-4


Îro Konsepta ser Rojava Versiyonek Komploya 15’ê Sibatê ye — E.Pêjder Altan R-5


Civak û Parastina Rewa — Ehmed Hesen R-7


Dem Hatiye Saziyên Rewşenbîran Bibin Yek... Sibe Dereng e — Kemal Necim R-9


Bi Yekîtiya Kurdan wê Azadî Misoger Bibe — Gulîstan Xalid R-10

# Jin li Îranê; Di navbera kiryarên girtin û darvekirinê

Xwepêşandanên gel li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ku di 28'ê Kanûna 2025'an de hatine destpêkirin bûye kirîza mirovahiyê, êdî cih di zîndanan de neman e. Di wan xwepêşandan de bi zanebûn jin kirine hedef û bi dehan jin bi guleyên dewletê jiyana xwe ji dest dane. Di heman demê de ji destpêka sala 2026'an ve pênc jin hatine darvekirin.

**Esma Miştefa**



Xwepêşandanên gel li bazarên Tehranê dest pê kirin û di 28'ê Kanûnê de li parêzgehên din îranê bi siyaseta xwe ya meleyi, tund, dîktator û olperest di dîroka xwe de rastî gelek serîrakirinên bi vî awayê hatiye, ne dur e di vê sedsalê de Serhildana Jin, Jiyan Azadî ya ku serhildanên Îranê bû. Ji ber ku cara yekem e bi reng,deng û helwesta jin serhildanek di dilê rejîma Îranê ya tund de bi vî awayî tê lidarxistin.

### Jinên ku perdeya tirsê qetandine

Serhildana Jin, Jiyan, Azadî di sala 2022'an de li dijî nêzîkatiya rêjîma Îranê li hember jina Kurd Jîna Emînî ya ku di encama lêdana polîsên exlaqî ve jiyana xwe ji dest da, bal û piştgiriya hemû jinên cîhanê kişand. Ji wê demê heyanî niha jinên Rojhilatê Kuridstanê û Îranê bi hezaran hatine girtin û heya niha jî tu çarenûsa wan jinan ne diyar e. Ev yek bi kîna dewletê yê li hember serîrakirina jin li dijî biryar û nêzîkatiyên dewletê bû. gelek jin di wan xwepêşandan û serhildanan de rastî biryara darvekirinê hatin û hatin kuştin. Hêjayî gotinê ye ku rûxmî derbasbûna çend salan li ser vê serhildanê re ya ku bi kiryarên dewletê hat bidawîkirin, lê hîna jî di dilê her jineke Kurd û farisan bi tayebet de ev serîrakirin nehatiye bidawîkirin. Ji lewra em niha dibînin ku di xwepêşandanên vê dawiyê de yê ku di encama hêrsa gel ji biryar û rewşa aborî yê Îranê de hatiye derketin. Gelek jin tê de cihê xwe girtine û bê tirs li hember sîstema dewletê careke din dengê xwe bilind kirine û li qada ne. Ev tê wê wateya ku jina ku perdeya tirsê li hember dewletê qetandiya êdî tu tişt nikarin wê bisekinîn in.

### Xwepêşandanên jin û hedefgirtina bi zanebûn ji hebûn û dengê jinê re

Di nava xwepêşandanên dawiyê de jî careke din jina banga mafê xwe kirin û bang kirin ku divê cezayê darvekirinê ji Îranê bê rakirin û bi taybet li ser jinan. Her wiha jinan ji bo guhertina tevahî sîstem û nêzîkatiyên dewletê him li hember gel bi tevahî û him jî ji bo qelsbûna rewşa aborî ya li wê derê rabûn ser xwe. Di wan xwepêşandanan de careke din hebûn û dengê jin hate hedefgirtin û bi sedan jin hatine bincavkirin û di zîndanên dewletê de girtî ne li gorî hin aliyên ku belgekirine bi dehan jinan di nava van xwepêşandanan de bi guleya dewletê bi zanebûn, jiyana xwe ji dest dane.

Li gorî raporên ji nav Îranê derketine, hedefgirtina rasterast ji dil û hiş a xwepêşanderên jin yek ji sûcên rêxistinkirî ya xwepêşandanên dawî pêk tîne. Di nava xwepêşandanên gel de di Vîdyoyên belgekirî di yek dîmenê de herî kêm 10 jin hatin nîşandan ku gule li serî, çav û dilê wan de hatine reşandin.

Ew vîdyo cenazeyên jinên ku mirine an jî nefesên xwe yên dawî didin nîşan ku tenê "sûcê" wan hebûna wan li kolanê û beşdarbûna wan di xwepêşandanan de ye. Ev jin hemû bêçek bûn, û ji aliyê wan ve tu pevçûnên çekdarî nehatine tomar kirin. Her wiha Sekvanên li ser banên xaniyan li Îranê bi zanebûn jin û gelê sivîlan dikin hedef.

Li gorî ku di raporên Meclisa Jin ya Berxwedana Îranê de hatiye belavkirin ev yek tekez kirin.

### Beşa jinan a girtîgeha Evînê: qerebalixî, nebûna agahiyan û zexta berdewam

Raportên destpêkê yên di destpêka xwepêşandanan de nîşan didan ku jinên girtî bo beşa jinan a girtîgeha Evînê hatine veguhastin; Ev beş ji zîndana Evîn weke ku di raporên berê de jî hatiye wesifkirin ji aliyê girtiyên siyasî ve, gelek xirab e.

Li gorî agahiyên ji çavkaniyên hundirê girtîgehê, zêdetirî 80 jinên xwepêşander bo vê beşê hatine veguhastin. Girtî hema hema rojane ji bo lêpirsînê têne gazîkirin, lê hin ji wan venagerin beşê, û tu agahî li ser cihê wan an rewşa wan a fîzîkî û psîkolojîk tune. Malbatên van girtiyan jî di bêdengiyek giştî de dijîn û ji rayedarên girtîgehê tu bersivên zelal wernagirin.

Qerebalixiya li beşa jinan a girtîgeha Evînê girtiyan neçar kiriye ku bi nivînan li erdê razên, û ew ji pêdiviyên herî bingehîn jî bêpar hiştine. Hin ji wan bi rojan e cilên paqij an jî tiştên kesane yên girîng wernegirtine, û daxwazên wan ên dubare ji bo van pêdiviyan bêbersiv mane.

### Beşa jinan li girtîgeha Adil Abad li Şîrazê

Nêzîkî 150 jin û keçên ku di dema xwepêşandanan de hatine girtin, bo beşa siyasî ya jinan a Girtîgeha Adil Abad ya Şîrazê hatine veguhastin. Li gorî agahiyan, piraniya van girtiyan xwendekarên dibistanê ne. Beşa siyasî ya jinan a li Girtîgeha Şîrazê bi zorê dikare 30 kesan bigire. Di vê çarçoveyê de, hin ji girtiyên siyasî yên jin bo odeyên din ên ku ji bo kesên ku bi kuştin, dizî û sûcên narkotîkê têne tawanbarkirin tên veqetandin, hatine veguhastin.

### Girtina kesên jêrî 18 salî

Di 15'ê Çileya 2026'an de, Rêxistina Mucahîdên Gel a Îranê (PMOI/MEK) ragihand ku di navbera 7 û 24'ê Çileyê de, di dema xwepêşandanên giştî ya gelê Îranê de zêdetirî 50'î hezar kes hatine girtin. Di nav kesên ku hatine girtin de hejmarek kesên di bin 18 salî de hebûn, ku li gorî qanûnên navneteweyî wekî zarok têne hesibandin.

Li gel van girtinên berbelav, zêdekirina îşkenceyê, zexta bi armanca wergirtina îtîrafên bi zorê û înkarkirina mafên bingehîn tirsa ji cezayên dijwar, di nav de cezayê mirinê, zêde dibin.

Bi qutbûna înternetê û qutbûna wesîleyên denûsandinê bi malbatan re nîşan didin ku şêwazek wisa li girtîgehên din ên li seranserê welêt jî diqewime ew jî; înkarkirina ragihandin û serdanan, nebûna xizmetên bijîşkî, qerebalixiya giran, û astengkirina gihîştina parêzerên serbixwe. Malbatan hatine agahdarkirin ku ew tenê dikarin parêzerên ku ji hêla dadweriyê ve hatine tayînkirin bikar bînin.

Ev tesbît û belgeyên ku hatine kirin dide nîşandan ku binpêkirinên mafên mirovan ên sîstematîk û rêxistinkirî di girtîgehên Îranê de di dema tepeserkirina serhildana neteweyî de derdikeve holê. Ev yek ne tenê li ser girseya gel tê kirin di heman demê de li ser jin tên bikar anîn. Bi vê yekê re weke ku me aniye ziman li jor, rêjîma Îranê ji deng û helwesta jinan ya serhildanê bo azadî û mafê xwe ditirse. Ew hê tirsa serhildana Jin, Jiyan, Azadî jiyan dike. Bê guman kiryarên rêjîma Îranê di vê derê de nehatiye rawestandin. Di Sala 2026'an tenê de pênç jin biryara darvekirinê kuştin e.

Di sala 2026'an de darvekirina pênç jinan li Îranê:

### Tayîbe Hekmet; yekemîn jin di sala 2026'an de tê darvekirin

Tayîbe Hekmet dayika sê zarokan a 53 salî, di sibeha roja Sêşemê 6'ê Çileya 2026'an de li Zindana Navendî ya Zencanê hat darvekirin. Hekmat yekem jina ku di sala nû ya 2026'an de li Îranê tê darvekirin e.

Desthilata Îranê nêzîkî heft sal berê Tayîbe Hekmet bi tewana kuştina mêrê xwe girtibûn û piştî derbasbûna ji pêvajoyên qanûnî cezayê darvekirinê lê hatibû birîn.

Heta dema amadekirina vê raporê, ne medyaya dewleta Îranê û ne jî saziyên dadwerî darvekirina wê bi eşkereyî ranegihandine.

### Suheyla Azîzî

Di sibeha roja Çarşemê 7'ê Çileya 2026'an de, cezayê darvekirinê li dijî girtiya bi navê Suheyla Azîzî li Girtîgeha Wekîl Abadê ya Meşhedê hat birîn. Ew berê bi tewana têkildarî madeyên hişber hatibû girtin û piştî temamkirina muameleyên qanûnî li Dadgeha "Şoreşê" cezayê darvekirinê lê hatibû birîn.

Heta niha, derbarê pêkanîna vê cezayê de ji aliyê berpirsên girtîgeha Wekîl Abadê ya li Meşhedê an jî rayedarên dadwerî û cîbicîkar ên pêwendîdar ve ti daxuyaniyek fermî nehatiye dayîn.

### Ekram Rezayî

Girtiyê bi navê Ekrem Rezayî roja Sêşemê 13'ê Çileya 2026'an li Girtîgeha Reştê hat darvekirin. Ew sêyemîn jina ku sala 2026an de li Îranê tê darvekirin.

Ev darvekirin û zêdebûna pêla darvekirinê bi hemdemiya xwepêşandanên berfireh û qutbûna înternetê ya giştî li Îranê re pêk hat. Ekrem Rezayî bi sûcê kuştinê hate mehkûmkirin û cezayê darvekirinê lê hate birîn. Heta dema vê raporê, ne rayedarên girtîgehê û ne jî saziyên dadwerî yên peywendîdar bi fermî piştrast nekirine ku darvekirin hatiye kirin. Piraniya jinên ku ji aliyê rejîma melayan ve hatine îdamkirin, di eslê xwe de qurbaniyên şîdeta navmalî û qanûnên cudakar ên di malbatê de ne, û gelek ji wan ji bo parastina xwe ev sûc kirine û di encamp de hatine darvekirin.

### Kîmya Xanî

Girtiyeke jin bi navê Kîmya Xanî roja Duşemê 19'ê Çileya 2026'an di sibeha roja Duşemê de li Girtîgeha Îsfahanê hat darvekirin. Ew çaremîn jina ku di meha yekem a 2026'an de li Îranê hat darvekirin bû. Kîmya Xanî bi tewana têkildarî madeyên hişber cezayê darvekirinê lê hatibû birîn.

### Leyla Cudkî

Di sibeha Yekşemê, 25'ê Çileya 2026'an de, cezayê darvekirinê li dijî girtiyeke jin a bi navê Leyla Cudkî li Girtîgeha Qomê hat birîn. Leyla Cudkî pêncemîn jina ku di meha yekem a 2026'an de hat birîn e. Piştî ku bi sûcê kuştinê hat mehkûmkirin, dadgehên cezayî cezayê darvekirinê lê birîbûn.

### Di dawiyê de em dixwazin vê yekê jî bînin ziman

Li îranê di bin destholatdariya Melayî de, endamên tora hêzên sersînor yên girêdayî Xameneyî qaçaxçîtîya hejmar û miqdarên gelek mezin ji madeyên hişber dikin. Ev yek dibe sedem ku ciwan bi taybet pê ve werin girêdan û jiyana ciwanan talan bibe him, li Îranê him jî li Rojhilata Navîn. Di heman demê de, madeyên hişber bi hêsanî û fermî ji girtiyan re di girtîgehan de têne peyda kirin da ku îrade û berxwedana wan bişkînin. Di demekê de ku kesên di van sûcan de cih digirin tu cezayek nabînin û heta jiyaneke xweş dijîn, kesên bêparastin ên mîna Suheyle Ezîzî û Kîmya Xanî ku ji ber xizanî û bêkariyê ber bi vê rewşa xirab ve diçin, bi mirinê têne mehkûm kirin.



# Li Sûdanê Îdiayên bikaranîna çekên kîmyayî û bêdengiya navneteweyî

Şerê li Sûdanê di sala xwe ya sêyemîn de berdewam dike, di demekê de ku qurbaniyên mirovî bi awayekî bêhempa zêde dibin û tawanên bikaranîna çekên qedexekirî yên di asta navneteweyî de zêde dibin, ev yek jî pirsên nû di derbarê bandora mekanîzmayên hesabpirsînê yên navneteweyî û şiyana wan a parastina sivîlan, derdixe holê.

**Navenda Nûçeyan**

Şerê di navbera artêşa Sûdanê û Hêzên Piştgiriya Bilez de di Nîsana 2023'an de ji ber nakokiyên li ser rêkeftinên veguheztina siyasî dest pê kir, berî ku bi lez veguhere aloziyeke mirovî ya herî mezin a cîhanê ku Neteweyên Yekbûyî wekî mezintirîn aloziya mirovî ya cîhanê bi nav dike.

### Tawanbarkirinên "kîmyewî"

Di raporekê de ku li ser platforma "SpaceStack" hatiye weşandin, rojnamevana Emerîkî Holly McKay diyar kir ku raporên karanîna çekên kîmyewî, di nav de gaza klorê, di dema pevçûna li Sûdanê de hene û diyar kir ku nebûna tedbîrên astengkirina navneteweyî yên bi bandor bêcezatiyê teşwîq dike.

Raportek ku di hejmara dawî ya kovara "Fair Observer" de hatiye weşandin, destnîşan kir ku delîlên ku ji hêla pisporên serbixwe ve hatine nirxandin nîşan didin ku di şerê li Sûdanê de çekên kîmyewî hatine bikar anîn.

Raportê diyar kir ku ev tawanbar, eger werin piştrastkirin dê binpêkirineke cidî ya qanûna navneteweyî û derbaskirina yek ji xetên sor di pevçûnên çekdarî de bin, nemaze ji ber ku Sûdan alîgirê Peymana Çekên Kîmyewî ye, ku derî li ber bandorên siyasî û dîplomatîk ên berfirehtir vedike herwiha rêyên çareseriyê û hewldanên navneteweyî ji bo kontrolkirina pevçûnê tevlihev dike.



Li gorî raporê, Peymana Çekên Kîmyewî rê dide welatên endam ku di rewşa binpêkirinên gumanbar de daxwaza vekolînên meydanî bikin, lê hîn ti welatekî daxwazek fermî ji bo aktîvkirina vê mekanîzmayê pêşkêş nekiriye.

Di raporê de hat destnîşankirin ku hewldanên dîplomatîk, di nav de daxwazên Emerîkayê yên ji bo vekolînan, ji aliyê artêşê ve hatin redkirin, ji ber pirsgirêkên têkildarî rewşa ewlehiyê û aloziyên jeopolîtîk.

### Fikar û pirsîn

Çavdêrên vê rewşê dibînin ku nebûna berpirsiyariyê di bûyera bikaranîna çekên kîmyewî de presedanek xeternak diafirîne, pergala navneteweyî ya ku bi pêşîgirtina li belavbûna çekên qedexekirî re eleqedar e lawaz dike û peyamên bifikar dişîne herêmên din ên şer. Di demekê de ku Sûdan di nav hevsengiyên herêmî yên aloz de cihekî hesas digire, raporên mafên mirovan hişyarî didin ku bêdengiya navneteweyî ya berdewam dikare bibe sedema binpêkirinên din û trajediya mirovî girantir bike.

### Hejmarên şokker û windahiyên nehatine ragihandin

Rêxistinên çavdêriya pevçûnan texmîn dikin ku di navbera Nîsana 2023 û Cotmeha 2024'an de nêzîkî 29 hezar kes hatine kuştin, di nav wan de zêdetirî 7 hezar û 500 sivîlên ku di êrişên rasterast de hatine kuştin, lê ev hejmar tenê bûyerên belgekirî nîşan didin.

Di vê çarçoveyê de, nûnerê berê yê Emerîkayê li Sûdanê Tom Perillo diyar kir ku hejmara rastîn a qurbaniyan, tevî mirinên ji ber birçîbûn, nexweşî û hilweşîna pergala tenduristiyê, dikare bigihîje 150 hezar kesan.

Lêkolînek ji aliyê Fakûlteya London ya Tenduristî ve jî gihişt wê encamê ku tenê li wîlayeta Xartûmê di nav salekê de zêdetirî 61 hezar kes mirine, ku ev rêje li gorî beriya şer nêzîkî ji sedî 50 zêdetir e.

Ji ber rewşa şer zêdetirî 12 milyon Sûdanî ji cih û warên xwe koçber bûne, di heman demê de zêdetirî 4 milyon kes li welatên cîran û di nav welêt de penaber bûne, nêzîkî 25 milyon kes bi bêewlehiya xwarinê ya giran re rû bi rû ne û li gelek deveran birçîbûn hatiye piştrast kirin.

Li kampa Zemzem a ji bo kesên bêwar li Darfûrê, ku nêzîkî nîv milyon kes lê diman, Rêxistina Bijîşkên Bêsînor ragihandin ku di heyamekê de her du saetan carekê zarokek jiyana xwe ji dest dide, ku ev yek nîşaneya xirabûna rewşa mirovî ye.

# Jinên Hindistanî ji bo Rojava daxuyanî dan: Hêviyek di bin dorpêçê de

**Navenda Nûçeyan**

**Jinên Hindistanî ji bo piştgiriya Şoreşa Jinê ya Rojava bangî akademîsyenên jin, femînîst, nivîskar, rojnamevan, hunermend, siyasetmedar û parêzvanên mafên mirovan ên ji eyaletên cuda yên Hindistanê kirin.**

Di daxuyaniya ku bi sernavê "Hêviyek di bin dorpêçkirinê de" de, bang li parastina Şoreşa Jinê ya Rojava û parastina destkeftiyên demokratîk ên ku jin pêşengiyê lê kirine hate kirin.

Ev daxuyanî ji aliyê 221 îmzageran ve hate piştgirîkirin. Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku modêla wekhevî û demokrasiyê ya li Rojava bi pêşengiya jinan hatiye pêşxistin, ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo hemû jinên herêm û cîhanê jî çavkaniyeke dîrokî ya îlhamê ye. Hate gotin ku êrîşên li ser Rojava rasterast destkeftiyên jin û şoreşa jinê hedef digirin û hate daxwazkirin ku ev êrîş bi lez bêne rawestandin.

Di nav îmzageran de gelek navên naskirî yên qadên huner, akademî, medya, mafên mirovan û siyasetê cih digirin. Di nav wan de rexnegiriya hunerê Geeta Kapur, wênekêş Nilima Sheikh, akademîsyenê fêmînîst Mary E. John, nivîskar û çalakvana fêmînîst a navdar a Amerîkayê Eve Ensler, danser û çalakvan Mallika Sarabhai, derhênerê belgefîlm Anand Patwardhan, akademîsyen Uma Chakravarty, rojnamevan Pamela Philipose û John Dayal, parlamenterê berê Jawahar Sircar, nivîskar Ram Puniyani û parêzvanê mafên mirovan Shabnam Hashmi hene.



Îmzager ji jinên xebatkarên huner û medyayê, fêmînîstan, saziyên jin, çalakvan, xebatkarên civakî, akademîsyen, hiqûqnas û kesayetiyên siyasî yên niha an berê pêk tên. Komên herî mezin jî çalakvanên serbixwe û kesên ku li qadên mafên mirovan, aştiya civakî û edaleta civakî dixebitin pêk tînin.

### Aştiya mayînde bê parastina destkeftiyên jinan ne pêkan e

Her çiqas daxuyanî di dema şer de hatiye amadekirin jî, piştî pêşketinên dawî yên di navbera Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê û hêzên Kurd de, rawestandina pevçûnan wek gaveke erênî pîroz dike. Lê îmzager destnîşan dikin ku aştiyeke mayînde û edalet tenê bi misogerkirina destkeftiyên siyasî, hiqûqî û civakî yên gelê Kurd û jinan pêkan e.

Hate gotin ku piştî banga piştgiriyê ya 30'ê Çileyê li hemberî şerê li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê, pêşketinên nû momenteke siyasî ya nû ava kirine. Jinên Hindistanî bal kişandin ku divê ev pêvajo ber bi aştiyeke mayînde, edalet û demokratîk ve biçe. Di vê çarçoveyê de, daxwazên şênber ên jin û gelê Kurd li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji aliyê jinên Hindistanê ve jî hatine qebûlkirin û gihandine raya giştî.

**Daxwazên ku jin qebûl kirine ev in:**

- Mafên ku ji bo gelê Kurd û hemû gelên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijîn di destûra bingehîn de mîsogerkirî bên naskirin.

- Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî fermî bên naskirin.
- Destkeftiyên siyasî, hiqûqî û civakî yên ku jin di pêvajoya şoreşê de bi dest xistine bên parastin û mîsogerkirin.
- Ji bo gelên ji ber şer koçber bûne, bi taybetî li Efrîn û Serêkaniyê yên dagirkirî, vegerandina ewle, bi dilxwazî û bi rûmet bên misoger kirin.

Di nav îmzavanan de nêzî 40 akademîsyen, siyasetmedar û çalakvanên mêr jî cih digirin.

# Sedsala 21'ê tekez wê bibe sedsala gelê Kurd

Leyla Amûdê

Em Kurd di destpêka sedsala 21'ê de ne û hîn jî em di bin nîrên zilm û zordariyê de ne. Rewrewkên serxwebûn û azadiyê hîn jî ne diyar in. Ne ji ber em ne yek in û ji hevdu hez nakin. Belê di gelek dem û dewranan de Kurd bûne yek û ji hevdu hez kirine. Lê dîsa jî hatine xapandin û şoreşên wan têk çûne. Di nêrîna min de û baweriya min e jî ew e ku sedema herî mezin a vê rewşa Kurdan desthilatdarên Îslamî ne. Artêşên Îslamê ji Piştî Mîladê 640'î ve êrîşî xaka Kurdan kirin.

Piştî ola Îslamê bi darê zorê derbasî Kurdistanê bû, gelê Kurd dewrana xwe wenda kir. Yên karîbûn xwe sipartin çiyayan, yên nikarîbûn jî ketin rewşeke bindestiyê. Cih û warên wan hatin xerabkirin, di komkujiyan re hatin derbaskirin. Hebûna wan hat înkarkirin, rastî asîmîlasyoneke dijwar hatin. Têkldarî Kurdan gelek çîrokên reşkirinê hatin vegotin û belavkirin. Hinek ji Kurdan ji bo xwe bi desthilatên Îslamî bidin qebûlkirin, her tişt kirin. Welat, milet, ziman û çanda xwee feda kirin. Gotin, "Tenê ol û axret." Tevî zimanê Quranê fêm nedikirin sure ezber kirin. Ev dinyaya em lê dijîn û nîmetên wê ji bîr kirin.

Belê di dîroka miletê Kurd de gelek caran şoreş pêk hatine, lê di meydanên şer de bi navê Mislimantiyê hatine xapandin û qirkirin. Tevgerên Kurd û pêşengên wan bi destê dewletên dagirker ên Mislimanan hatine kuştin û darvekirin. şêx û melên me xapandine û şoreşên me têk birine. Ketine pey xapandin û tinekirina gelê Kurd. Tevî Selahedînê Eyûbî (Selahedînê Kurdî) gelekî ji bo ola Îslamê têkoşîn kir û êrîşên Xaçiyan şikand jî li hember Kurdan dijmintiyê dikin.

Weke tê dîtin çeteyên DAÎŞ'ê serê mirovan jêdikin. Ji me Kurdan re dibêjin, "Kafir, xenzîr" û hwd. navên cuda ji bo me bi kar tînin. Gelo sedema ev zilma ku Misliman li me Kurda dikin çi ye? Em weke Kurd her dibin destên desthilatdariyan de hatine perçiqandin û bûne hêsîr.

Hemû welatên Misliman ji olê qezenc kirin. Xwe û welatê xwe gihandine qonaxên pir cuda. Lê weke neteweya Kurd her em man mihacir û perîşan. Wan dewletan ji bo berjewendiyên xwe Mislimantî weke tivingekê kirine singa me û pê şerê me kirine. Tevî di ola Îslamê de nehatiye gotin ku welatê birayê xwe yê Misilman dagir bike û bixe bin destê xwe jî vê tînin serê me. Birayên me yên Misliman her li me dane. Her tiştê me ji destên me girtine, em ji xwe re kirine kole. Hîna jî eniya me bi sicadê ve leziqiye û em dibêjin em Îslamî ne. Baş e tekez divê em û hemû mirovahî li gorî pêxember û eshaban biçin, lê gelo kî li gorî wan diçe ji derveyî me? Eger em ewqasî Îslamî ne naxwe pêwîst e em rastiya wan kesên derewker jî derxînin ronahiyê. Ya din jî divê em neyên xapandin û weke hêza parastina cewhera Îslamê hemû derewker û munafiqan teşhîr bikin. Hewce ye em siyaseta kembera kesk têk bibin û hew werin xapandin. Careke din ez dibêjim wê sedsala 21'ê bibe sedsala gelê Kurd. Wê ti hêza tundrew nikaribe hêz û ezma me bişikîne û wê serkeftin ya gelê Kurd be.

# Yekîtî 2+2=1

Mîrza RONÎ

Gelê Kurd di nav pêvajoyeke man û nemanê re derbas dibe. Di vê pevajoya ku ji serê salê pê de destpê kir; gelê Kurd kete nav cengeke giran de.

Plan û armancên ku rêveberiya demkî ya Şamê û hevalpiştên wê, di serî de desthilata Tirkiye û hin dewletên ereban ku îcaza xwe ji dewletên hegemon standin û yekser êrîşî destkeftiyên kurdan kirin. Desthilata Şamê hemû komên çekdar ên ku bermahiya DAIŞ'ê ne kom kirin û li dora bajarê Helebê û heremên Rojava kom kirin. Armanca planê destdanîna ser bajarên kurdan û qirkirina Kurdan bû, lê belê berxwedana gelê kurd bi awayekî civakî li hemberî êrîşên wan rawestiyan û planên wan eşkere kirin. Di sêrî de berxwedana asayîşa civaka kurd ya taxên Şexmeqsud û Eşrefiyê bû mînak ji bo xwedî lêderketina destkeftiyên kurdan. Ango pêşdîtina hêza kurd ya sîyasî û civakî planên ku çeteyên desthilata Şamê û hevalpiştên wê armanç dikir, vale derxistin. Sekna fermandar Ş. Ziyad Helep û rêhevalên wî bû sembol ji bo xwedî derketina berxwedana Rojava.

Helbet di vê pêvajoya cenga giran de gelê Kurd xemdar bû û êşiya. Lê belê gelê Kurd qedîme û gelek caran planên mêtinkaran vale derxistine û ji nav êşa xwe jîndar derketiye. Gelek ramyar dibêjin; ''Êşa ku mirov ne kuje, ew êş mirov jîndar dike.'' Tê zanîn di nav mîtolojiya kurdan de çîroka Teyrê Sîmûr heye, ev çîrok raste rast li gelê Kurd tê û gelê Kurd wekî Teyrê Sîmûr e. Çawe ku Teyrê Sîmûr ji hêza xwe bixwe bawere, gelê kurd jî ji hêza xwe bawere û her car dikare xwe komî ser hev bike û li ber xwe bide. Heke gelê Kurd ne wekî Teyrê Sîmûr bûne, ev gelê ku di nav çar dewletên kîndar de parçe bûyî wê çawe hêzeke berxwedanê ava bike ku di cîhanê de bîbe mînak û liberxwe bide û teybetî jî hêza jina kurd Teyrê Sîmûr bi xwe ye.

Dema mirov li pêvajoya xedar dinêre heke civaka kurd li her qadê jiyanê li rojava xwedî derneketa wê armancên mêtinkaran bi ser biketana. Lê belê dema êrîşên li ser Rojava rûdan û gelê kurd berxwedana hêza cewherî ya cîvaka kurd dît bi yekgirtineke pîroz gelê kurd derket kadan û piştgiriya xwe berz kirin.

Di sêrî de ji hêla gel ve rakirina têlên sînorê di navbera Nisêbînê û Qamişlo de bû destpêka sekna berxwedêr ya gelê Bakurê Kurdistanê. Her wiha bajarên Başûrê Kurdistanê Silêmanî, Hewlêr, Zaxo û Dihokê agirê berxwedanê gur kir û gel rabû ser xwe. Dîsa li bajarên dîasporaya kurdan gelê Kurd bi yek dengî daketin kolanên Europa û li Rojava xwedî derketin.

Çend xalên gelekî pîroz û rêzdar ji nav çalekîyên gelê Kurd derketin holê. Ya yekemîn ew bû ku li seranserê Kurdistanê gel daketin qadan. Xaleke din a girîng ew bû ku bi yek armancê gelê kurd hat ba hevdû û li berxwedana Rojava xwedî derket. Dîsa xaleke din a cihê şanaziyê ew bû ku hemû alayên Kurdistanî di heman qadê hatin bilind kirin û bê ku kes kesî aciz bike bi yek dengî li Rojava xwedî derketin.

Dema mirov li plana êrîşa li ser Kurdan de hat û li beramberî vê planê li sekna gelê Kurd dinêre yek tişt tê bîra mirov ew jî ew e ku; yekîtîya kurdan û berxwedana şervanên kurd bûye sedem ku plana pirhêl vale derkeve. Di encamê de ev sekna yekîtiya kurdan bû sedem ku lihevkirinek di navbera aliyê kurd û rêveberiya demkî ya Şamê de çêbibe.

Başe wî demî baş zelal bûye ku gelê Kurd êdî bi yek dengî dibêje: ''Yeke Yeke Yeke Gelê Kurd Yeke.''

Dema min hewl dida vê gotarê binivîsim, çavên min li wênekeyî ket ku li ser rêyeke Qamişlo hatibû daliqandin. Li ser wêne; wêneyê Abdullah Ocalan, Mesut Berzanî, Mam Celal Telebanî, alên Kurdistanê û alên YPG û YPJ hebûn. Ji xwe ev wêne tenê bese ku êdî dem hatiye yekîtiya gelê Kurd di her warî de pêk were. Beriya niha di salên 2013-2014'ê de dema pêvajoya aştiyê li Tirkiye berdewam, wî demî Rêber Ocalan çend caran banga avabûna kongra Netewî ji hemû aliyan kir. (11.07.2014) her wiha ji bo xebatên avabûna kongreya yekîtîya kurdan Leyla Zana çû hevdîtina Ocalan û li ser vê mijarê axivin, piştî hevdîtinê diyar bû ku Ocalan nameyek ji Mesut Berzanî re şandiye û di nameyê de daxwaza avabûna kongreya yekîtîya kurdan hatiye xwestin. Lê belê ew bang wî demî encam nebû û li bangê xwedî derneketin. Di pêvajoya îro de ew bang baştir tê fêmkirin ku heke wî demî ew bang bi erênî encam bibûya û hemû partî û hêzên kurdan li hev kom bibûyan û di encamê de kongereya netewî bi yek dengî ava bibûya wî demî îro ev êrîşên xedar jî, bi ser gelê kurd de bi vî awayî nedihatin.

Dema kongeryeke netewî ava bibe, mecliseke giştî ku ji hemû pêkateyên kurdan pêk were saz bibe û di wê meclisê de biryarên; yekîtîya artêşa kurdî, yekitîya siyasî, aboriya kurdistanê, çanda kurdî, rêveberiya kurdistanê û gelek xalên din ên civaka kurd wekî biryar bihatan standin wî demî dijminên kurdan bila ji xwe re siyaset bidîtan.

Kurt û kurmancî heta ku yekîtiya kurdan bi kongreyeke netewî ku hemû pekateyên kurdî di nav de biryarên xwe ji bo azadiya gelê kurd ne girin wê hêj gelek caran dijminên kurdan êrîşî nirxê gelê kurd bikin. Îro kongreya netewî ji kurdan re wekî nan û av pêwîste.



## Bi Yekîtiya Kurdan wê Azadî Misoger Bibe

Gulîstan Xalid

Êrîşa ku ji şeşê çileyê ve ji aliyê HTŞ û çeteyên girêdayi Dewleta Tirk ve li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê destpêkir û piştre ev êrîş berfereh bû û bû êrîşeke li ser tevahî ya Şoreşa Rojava û destkeftiyên şoreşê, da nîşandan ku kurd careke din bi komployeke navneteweyî re rû bi rû tê. Jiber her kes dizane ku li pişt van êrîşan gelek hêzên heremî û navneteweyî jî hene. Dîsa hesab û berjewendiyên hêza bi siyaseteke bê exlaq li ser hesabê xwîn rijandina kurdan û tunekirina wan di meriyetê de ye.

Di vî şerî de careke din rastiya hişmendiya ku hîna jî kurdan weke gelekî ku xwedî nasnameye, çande, dîroke û xwedî mafê azadiyê ye qebûl nake xuya bû. Şoreşa Rojava ku bû şoreşeke gerdûnî û ji her devera cîhanê mirov berê xwe danê elbette komplogeran ji zûve xistiye nava fikaran. Jiber ev şoreşa ku bi pêşengtiya kurdan ve hatiye li darxistin xwedî felsefeyeke ku azadiya hemû mirovatiyê diparêze û ev yek jî ji bo desthilatdar û dijminê azadîxwazan metirsîdare. Hinek dewletên weke Tirkiye ku diçin û tên dibêjin metirsiyên min yê ewlekariyê û bi vê hincetê ve hewil didin sedemên êrîşa ava bikin, metirsiyên hemû hêzên ku li piş vê êrîşê hebûne îfade dike. Metirsiya ewlekarî ya ku ew qal dikin metirsiya lewazketina sistemê ku bi sedsalan îrade û azadiya mirovatiyê binpê dikine.

Pazdeh salên şoreşa Rojava ye ku di her salekê de bi êrîşan re rû bi rû hat, lê di êrîşa vê carê de bi rastî pîlana tesfiyê û qirkirineke bi temamî di meriyetê de bû. Her kurdek li her çar parçeyê kurdistanê û li her devera cîhanê vê carê ev yek ji kûrahî ve hîs kir. Êrîşa li ser Rojava pîlanê êrîşeke topyekun ya li ser gelê kurd û şoreşa ku dengê azadîxwazan bû û ev yek bi awayeke zelal hate dîtin. Ji lewma dengê Gelê Kurd li her derê bilind bû, her çar parçeyê kurdistanê û mirovatiya azadîxwaz li Rojava bû yek. Ger ku ev pîlan gava wê ya yekê hate vala derxistin jî jiber vê sekna gel ya hevgirtî bû. Vê carê gel bi sekna xwe komplo vala derxist. Lê xeterî hîn bi dawî nebûye. Lewma ya giring ji niha û şûnve jî gel bi rihê ku hate nîşandan di nava rêxistinbûyîneke hevgirtî de be.

Di vî şerî de dîmenê du şervanan gel hev hebû, şervanek dibêje ma tehalüf (kuwalisyon) li vir çi dike, şervanek bi hêrs dibêje, kuwalisyon kiye, em hene em. Ev bersiv helwestek bû û pir bi wate bû û peyama dema nû ji bo her kurdek da. Kurd ewê tenê bi hêza xwe bawer bin û bi rêxistinbûyina xwe. Lihevkirinên demkî ku hinek li ser propoganda dikin û dibêjin ji bo yekkirina xaka sûriye û aramiya herêmê giringe, tu garantiya wê ya demdirêj tûne. Jiber ev li hevkirin em dizanin ku niha ji bo rawestandina şere û pêkanîna hesabên komplogera ku niha dixwazin berê xwe bidin hinek deverên din. Lê pêwîste her kurdek bizanibe ku dema hesabên wan qediya ewê dîsa berê xwe bidine kurdan û ewê bixwazin ku kurdan bi temamî bê deng bikin. Ji lewma pêvajoya li pêşiya me giringe ku bi baldarî û hişyariyeke mezin kurd tev bigerin. Yekbûyîn û rêxistinbûyîna xwe xurttir bikin. Ancax bi vî rengî komplo bi temamî têk biçe û azadî misoger bibe.



# Bi ruhê komînal dayik xwarinê ji bo şervanan amade dikin

**Dayikên gundê Girbawî yê girêdayî bajarê Qamişlo diyar kirin ku ew her roj xwarinên germ ji şervanên li eniyên şer çêdikin û gotin, "Em di şev de parastina gund û axa xwe dikin û bi roj jî em xwarinê ji şervanan re amade dikin. Em bi hêza xwe bawer in û wê serkeftin bibe ya glê Kurd û Kurdistanê."**

Viyan Egîd/Qamişlo

Şervanên YPJ û QSD`ê ku li eniyên şer in li pêşiya çeteyên hikumeta demkî ya Şamê û dagirkeriya Tirk disekinin, tevahî gelê wan li pişta wan e. Li kantona Cizîrê dayik rojane xwarinê ji şervanên xwe re amade dikin û bi vî rengî tev li berxwedana parastina herêmê dibin. Dayikên gundê Girbawî yê girêdayî bajarê Qamişlo jî bi vê erkê radibin. Xwarina ku tê amadekirin jî, yekser ji şervanên li çeperên pêş re tên şandin.

Hêjayî bi bîrxistinê ye ku dayik ne tenê xwarinê amade dikin. Di heman demê de jî bi şev her dayik li kolana xwe nobedê digire.

Di derbarê çêkirina xwarinê ji şervanên di çeperên pêş de û xweparastinê de, dayikên gundê Girbawî ji Rojnameya me re axivîn.



Leyla Şêro



Semîra Mehmûd



### 'Em ê heta dawiyê li pişta şervanên xwe bin'

Leyla Şêro da zanîn ku ew weke dayikeke Kurd heya dawî wê piştgiriya şervanên xwe bike û wiha domand: "Ji bo jiyaneke azad û bi rûmet em ê heya dawî piştgiriya zarok û şervanên xwe bikin. Her wiha em îro li vir kom bûn ji bo xwarinê ji zarokên xwe re yê eniyên şer de amade dikin, ji ber ku hemî şervanên niha di xetên pêş yên cebhê de ne, keç û xortên me ne, em çi jî ji qan re bikin û pêşkêş bikin wê kêm be. ev 14`e sale ku gel û axa xwe ji qirkirin û êrişên hovîtiyê diparêzin. Bêguman di vê qonaxê de çi ji me were xwestin, em amade ne. Çi amedekirin xwarinê be, çi jî rakirina çekan be. Niha jî em dayikên gundê Girbawî, di heman demê de xort, keç û bav heya sibha nobet û parastina gund dikin, dema dibe sibeh jî bê rawistandin dayik dest bi amadekirina xwarinê dikin, em xwarinên cur bi cur û germ ji zarok û şervanên xwe çêdikin. Em piştgiriya wen dikin, wê serkeftin ya me be. Em piştgirtiya şervanên xwe dikin heta dawî û em bi wan bawer in. Em tu carî ji welatên xwe dernakevin."

### 'Hevgirtin û îradeya me ji hêz, siyaset û planên dijmin mezintir e'

Leyla Şêro di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku hebûn û yekîtiya jinan berxwedanek mezin e û wiha anî ziman: "Ji bo ku em ji şervanên xwe re di nava serma û seqemêde ne, em tevahê dayikêb gundê girbawî kom bûn ji bo xwarinên germ em ji wan re amade bikin. em çi jî bikin her em xwe kêm hîsdikirn pêwîst e em ked û gavên mezintir ji wan re bikin. di heman demê de em ê heya dawiyê deyndarê şervan û şehîdên xwe bin. Dijminê dinyayê yek e, li dijî mene. Lê wê ti hêz nikaribe hevgitina gelan û yekitiya Kurdan li hemû cîhanê bişkîne. Em berxwedana gelê Kurd li herçar parçeyên Kurdistanê silav dikin û ji bo doza Kurd her tim daxwaza vê berxwedanê dikin. Me di şoreşa Rojava de yekîtiya Kurdan serxist, ev yek cihê serbilndiyê de, niha dijmin ji yekêîtiya me di tirse, hewil dide ku tevlîhevî û fitne derbixin. Lê wê nikaribin, hevgirtin û îradeya me ji hêz, siyaset û planên wan mezintir e."

### 'Jinên li gundê Girbewaî hemû bi hevre alîkarin û yek destin'

Di heman çarçoveyê de Semîra Mehmûd wiha anî ziman: "Tevahî dayikên gundê Girbawî li hev kom bûne, da ku em xwarinê ji bo şervanên xwe yên di eniya pêş de amade bikin. tenê çêkirina xwarinê em ji şervanên xwe re têrker nabînin, hegere ku şer jî ji me were xwestin em ê bikin. Eger çeteyên hikumeta demkî û dewleta Tirk a dagirker gefan li me bixwe, lê bi me dayikan mabe em ê li ber xwe bidin heta dilopek xwîn di canê me de hebe, heta dawiyê em ê piştgiriya şervanên xwe bikin. em na rawistin, wê westandin ne ji me re be, ji ber vê yekê me jinan bi hevdû re biryar daye ku em parastina xwe û ya axa xwe dewam bikin, lê kêleka parastinê jî her roj em ê xarinê ji zarokên xwe yên şervan re çêkin. Em her kes berpirsiyarê parastina mal, tax, gund û bajarên xwe ne. Jinên li gundê Girbewaî ya girêdayî bajarê Qamişlo, hemû bi hevre alîkarin û di her alî de yek destin. Her wiha em hazirin ku zarokên xwe yên biçûk bê xwarin bihêlin, lê şervanên me yê di çeperên şer de bê xwarin nehêlin."

### 'Wê serkeftin bibe ya gelê Kurd û Kurdistan'

Semîra Mehmûd di dawiya axaftina xwe de bang li hemû gel kurd kir ku ji bo Kurdan rabin û li her derî bibin yek û wiha pê de çû: "Em wekî jin bi hêvîne ku wê Kurdstana me were avakirin. Helbet Kurdistan jî wê bi ruhê kurdîtiyê û yekîtiya wan wan were avakirin, ez dayikek Kurdin û bang li tevahî kurdên her çar parçeyên Kurdistanê û derveyî wê dikin ku bi yek helwest, deng, ruh û dest bin. Pêwîst e gelê Kurd di qadan de biherikin. Em zarokên vê axê ne, emê li vir bijîn û bibin palepişta zarokên xwe yên şervan. Ez ji şervanan re dibêjim ku em dayikên we ne û hûn jî zarokên me ne. Em bi hêza xwe bawer in û cîhan behsa hêza Kurdan dike û wê serkeftin bibe ya gelê Kurd û Kurdistan."

# 'Ez dixwazim çarenûsa kurê min were eşkerekirin'

Birûc Resûl/Qamişlo

**Dayika bi navê Cîhan Elî diyar kir ku di roja êrişên çeteyên hikumeta demkî di 18'ê Çileyê de kurê wê û hin hevalên wî yên şervan li Dêrazorê dîl ketin destê çeteyan de û wiha got: "Ez nizanim kurê min saxe yan jî şehîde. Roja ku agahî ji kurê min Rêwan hatiye qutkirin, ne roja min roj e, ne jî şeva min şev e."**

Dayika ku bi navê Cîhan Elî bi dilekî şewat behsa windabûn ango dîlgirtina kurê xwe yê ku ji aliyê çeteyên hikumeta demkî û dagirkeriya Tirkiyê ve hatiye girtin dike. Kurê wê Rêwan Osman yê ku bi navê Rêko tê nasîn, di sala 2011`an li bajarê Qamişlo tevlî refên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bû û ji 18'ê Çileyê ve li Dêrazorê ji aliyê çeteyan hatiye dîlgirtin.

Dayika Rêwan (Cîhan Elî) diyar kir ku cara herî dawî di 18`ê Çileya 2026`an saat 12`ê nîvro de Rêwan bi telefonê pê re axivî ye û wiha domand: "Wî ji jin min re got ku rewşa wî baş e. Piştî wê, di danê êvarî de me bihîst ku Dêrezor ket destên çetan de û hin şervanên me dîl hatine girtin. Me li vir hewil da ku bi rêya telefonê xwe bighînin Rêwan, lê her cara ku em lê digeriyan, telefona wî girtî bû. Piştî çend rojan me agahiyên net girtin ku Rêwan ketiya destê çetan de û tu kes nizane li kurin."

Dayika Rêwan ji me re hin agahiyên ku li ser kurê xwe wergirtine anî ziman: "Dema ku çeteyên Colanî êrişî Dêrazorê kirin, kurê min û hevalên xwe bi telîmatên hevalan vekşiyan, lê dema ku Rêwan û hevalên xwe derdikevin, êdî nasdikin ku hin hevalên wan yên jin jî hene û pêwîst e ku ew jî derkevin. Ji ber vê yekê Rêwan û 8 hevalên xwe vedigerin da ku hevalên xwe yên jin bi awayekî saxlem xilas bikin, lê mixabin li ser rê kemîn ji wan re hatibû çêkirin. Li gorî agahiyên ku ji me re hatin dibêjin ku Rêwan û hevalên xwe nêzî satekê di nava kemînê de man, piştre karîbûn xwe ji kemînê derbixin û berê xwe dan gundek ji gundên Dêrezorê, li vir berê xwe didin mala muxtarê gund, da ku wan li cem xwe veşêre, heya ku rêyek were pêydakirin û xwe xilas bikin. Lê bêbextî û xayin pir in, gor çavkaniyên ji me re gotin, Rêwan û her 8 hevalê xwe nêzî 3 satan di mala muxtar de dimîne û mixtar jî li wan baş mêze dikir hete ku dixwest rêyeke bi ewle ji wan re peyde bike. Piştî derbasbûne 3 sEatan nêzî 10 erebeyên çete li derdora mala muxtan kom bûn û mal kirine dorpêçê. Li vir hat nasîn ku cîranê muxtar agahî dane çeteyan ku were wan şervanan bigirin."

Ev zêdeyî 15`e roj e ku çavê yadê Cîhan Elî li rêya kurê wê Rêwan e, di heman demê de her roj jî bi dilekî şewat li ser kurê xwe digrî û



dibêjie, "Ez nizanim kurê min saxa yan jî şehîde, eger ku kurê min şehîd xistibin jî wê bi îşkenceye û zordarî hatibe şehîd xistin. Roja ku agahî ji kurê min rêwan hatiye qut kirin, ne roja min roje, ne jî şeva min şeve. Ez tenê dixwazin nasbikin kurê min di çi rewşê de ye û li kure, eger şehîd be jî bila agahiyê me çêbibe, ji ber em di navbera heviya verger û nevegera wî de dimirin.

# ‘Ji bo pêvajo dewam bike, divê Tirkiyê êrişan li ser Rojava rawestîne’

**Parlatenterê Wanê yê DEM Partiyê Mahmut Dindar diyar kir ku piştî şerê li ser Rojava dest pê kir her tiştê girêdayî pêvajoyê di cihê xwe de rawestiyaye, ji bo wê jî da ku pêvajo birêve biçe û dewam bike, pêwîst e mijara Rojava bê çareserkirin û got, “Dewleta Tirk destê xwe ji siyaseta qirêj a li ser Rojava nekşîne, wê tiştek rastî nîn be.”**

Ronahî Sadûn

Derbarê Pêvajoya Aştî û Civaka Demkratîk de û bandora êrişên li ser Rojava li ser pêvajoyê, Parlatenterê Wanê yê DEM Partiyê Mahmut Dindar bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Çend sal in gelê Kurd rastî qirkirin û komkujiyan tên, girîngiya Tevgera Azadiyê ji bo gelê Kurd çi bû û pê ve girêdayî pêvajoya Aştiyê xwedî çi girîngiyê ye?**

Ev 50 sal in heta bi sed sal jî li vî welatî ser gelê kurd qirkirin û komkujî dest pê kiriye û dixwestin kurdan li vî welatî tune bikin, yên nikarin wan tune bikin asmîle û koçber bikin, vê jî nikaribin bikin bi awayekî din zilm û azarê li wan bikin an êsîr bikin. Ji bo fikir û hişmendiya kemalîst ku her kes kirine tek şeklî yan jî tek zihniyeta îsalmî, pêk bînin. Armanca wan jî ne tenê gelê Kurd, gelên dîtir tevahî bi vî awayî divê ku ziman, çand û kevneşopiya wan ji kokê rakin û yên bûne Tirk li gorî xwe wan asmîle bikin û nebin jî bi rengekî ji rengan, wan di nava xwe de bihelînin. Li ser vê bingehê jî gelek komkujî pêk hatin û mixabin dewletê çi bi destê wê hatiye ser Kurdan pêk aniye. Gel, dayik, bav û me jî ev yek bi çavên xwe dîtiye. Li hemberî vê zilmê zêdeyî 42 salan tevgerek ku Rêber Apo serkêşiya wê dike bû parastina gel, welat û axa Kurd, dest pê kir. Vê tevgerê bersivekî bê hempa danî ortê. Dibe ku mînakek wek mînaka bersiva PKK di dinyayê de ku gelek gel daxwaziya azadbûna welat, ax, çand û hwd dikir, lê tu gel wekî gelê Kurd êşê nekişandiye û bedel nedaye. Ji ber dewletan Kurdistan kiriye çar parçe, Kurd ji hev qut kirine û hewl dane wan bikin weke xwe. Lê Tevgera Azadiya demek dirêj bûna gel û vî welatî xebatekî mezin da meşandin û bersiveke xurt da. Rast e di van salan de me gelek êş kişandin û hîn jî dikşînin, lê asta îro em gihaştinê û ev destkeftiyên ku me dest xistiye, Bi saya tevgera ku Rêber Apo ava kiriye PKK’ê şervan û qehremanê wê ne îro. Heger di nav dewlet de mijara me li ser masê ye, bi keda wan şervan û şehîdên PKK’ê ye ku dewlet neçar kir hin gav bavêje. Ji ber 2015’an û vir ve rastî jî çi ji destê vê dewletê, AKP, MHP û hikumetê hatiyê ku Kurdan tune bikin, dane meşandin ku qada şerê bajaran de ser ciwanan, dayikan û zindanan de eyîn ev zilm, işkence û kuştin dewam kirin. Dîsa jî gelê Kurd li hemberî van dagirkeran û ewqas zilma ku bi ser wan de hat, serê xwe netewand û çûg daneyînandin.

**Tiştê ku dewleta Tirk di partîkê de pêk tîne çi nîşan dide û nêzîkatiyeke çawa ye li hemberî pêvajoyê, herwiha divê aştiyeke çawa pêk bê?**

Tiştê îro li Rojava diqewime ew ku dewlet projeyên wan hene. Dewleta Tirk got çawa dewletên ereb hin jê ji ortê rabûn, êdî ev tişt hêdî hêdî bi aliyê min de jî tên. Lewma wê got em li gel Kurdan aştiyekê pêk bînin, da ku sibe tiştê li Sûrî û Îraqê tê kirin, bi serê me de jî neyê kirin. Ji berê de xelasbûna wan bi destê Kurdan çêbûye, li gorî wê jî dîsa gav avêtine. Tevgera Azadiyê jî zêdeyî 42 salan têkoşîneke bi bedêlên giranbuha, da meşandin. Ji bo wê jî pêwîst e dewleta Tirk destê aştiyê dirêj bike hinek gavan bavêje, lê mixabin dewletê ne li gorî vê cidiyetê ye. Gelê me jî tu carî baweriya xwe bi vê dewletê neaniye, ji ber pratîka wan a ji berê de ku li ser Kurdan tê kirin û di dîrokê de îxaneta ku bi Kurdan re kirine. Îro jî ku ev salak e pêvajo dest pê kiriye, lê heya niha tiştên ku pêwîstbû bihatana kirin, pêk nehatine, mixabin ji ber proje û planên wan hebû ku dereng vê yekê bikin. Ev jî hêdî hêdî tê zelalkirin û famkirin ku çima gavan navêjin. Em ê jî ji bo ku aştiyek hebe mafê Kurdan bê dayîn, ziman çand û hwd… ji yasa û qanûnan bê dayîn, di vî welatî de em jiyaneke bi hev re jiyan bikin, dixebitin. Lê mixabin heger ev neyên kirin, em ê her ber xwe bidin û destkeftiyên gel biparêzin, heta ku em daxwaziyên vî gelî bîne cih.

27’ê Sibatê Rêber Apo biryarek da li ser wê bingehê pêvajo dest pê kir. Şoreşa gelê Kurd ku demeke dirêje dewam dike, li gel vê şoreşê jî gelek êş hatin kişandin. Bi taybetî ji bo serketin û rêzgarkirina vî welat gelê Bakurê Kurdistanê gelek êşên mezin kişandin. Dayikên me her ku zarokên wan şehîd jî dibin, lê her zimanê wan ê aştiyê ye ku diibêjin; Bela di vî welatî de aştî bê kirin, zarokên Kurdan û Tirkan jî neyên kuştin. Lê em zanin siyaseta dewleta Tirk û hişmendiya wê hemû ser tunekirina gelê Kurd de. Ji bo wê aştiya ku bê avakirin ew e ku ewqas bedelên giranbuha hatine dayîn, mutleq gerek beramberî wê jî bê dayîn. Çima şoreş derket û berxwedanî hat kirin? ji bo li ser ax û welatê xwe jiyaneke birûmet bijîn. Heger xwin û xeyalên ciwanên me neyên cih, tu wateya aştiyê bi malbat, gel û şoreşê tune ye. Lewma li gorî vê Rêber Apo li gel dewletê muzakeretê dike. Rêber Apo beriya niha jî bi salan jî aştiyê dixwaze û divabû ji wan salan jî aştî bihata destpêkirin, lê mixabin ev dewlet bi tu awayî ber bi wî ve nehat. Lê îro ev gavavêtinên ji bo aştiyê em bi wate dibînin ku hinekî ew siyaseta çavê xwe xistine Kurd û Kurdistanê biguherînin û êdî di welat de vî şerî bidin rawestandin. Ji ber di serî de baweriya me Rêber Apo û Tevgera Gelê Kurd e.

**Gavên ku gelê Kurd dixwest ji pêvajoyê pêk bên û heya niha pêk nehatine çi ne?**

Gavên ku gelê me di destpêkê de dixwestin dewlet bavêje û li gorî dilê wan be, ew bûn ku hevalên me yên di zindnan de bêne berdan. Rêber Apo ji zindana Îmraliyê derkeve û li gel rêxistin û gelê xwe li ser pêvajoyê biaxivin û hwd… mixabin heya niha gavên wisa nehatine avêtin. Lewra ji ber van sedeman baweriya gel nayê ku dibêjin belkî dîsa xapandinek çêbibe. Ya rast jî ew e ku ev komsîyona hatiye avakirin van tiştan biguherînin û li gorî wê gavan bavêjin.

**Gelo êrişên li ser Rojava heya çi astê bandora xwe li ser pêvajoyê dike?**

Piştî şerê ku li Sûriyê dest pê kir her tişt di cihê xwe de sekniye. Ji bo wê da ku pêvajo birêve biçe û dewam bike, pêwîst e mijara Rojava bê çareserkirin. Heta di mijara Sûriyê de dewleta Tirk siyaseta qirêj a li ser Rojava destê xwe jê nekşîne, wê tiştek rastî nîn be. Tirk dihzire ku wan li Bakur aştî bi Kurdan re daye destpêkirin, lê di aliyekî din de jî li Rojava Kurdan di komkujiyan re derbas bikin. Tişta ku îro jî tê rûdan bi tu awayî sazî, ciwan û gelê Kurd qebûl nake. Herwiha




ev tişta ku îro li ser Rojava hatiye kirin çar parçeyên Kurdistanê, dostên wê û diyaspora Ewropa hemû rakirine ser piyan ev jî gelekî biwate û pîroze, xwedîderktina Rojava ye. Lê em hemû jî zanin sereka vî şerî dewleta Tirkiyê ye, ji ber biryarên Sûriyê li Enqerê têne rakirin. Ev jî çi dide nîşandina ku aliyekî tu dibêje ez ê li Bakurê Kurdistanê aştiyê bikim, milê din jî li gel Kurdên Rojava birayên me, tu wan tune bike û di komkujiyan re derbas bike, plan û projeyên xwe pêk bîne. Bi tu awayî ev ne mumkine, heger Tirkiyê bixwaze aştiyê ava bike, di serî de divê planên xwe li Sûriyê bi taybet li ser Kurdên Rojava bidawî bike û xwe ji wir veşkşîne.

Di heman demê de dewlet Tirkiyê wê nikaribe Kurdên ku 50 sal in ser hizira Rêber Apo hatine perwerdekirin û rêxistinkirin bixapîne. Bona wê jî em dîsa dibêjin, êdî gavavêtin hatiye sira dewleta Tirkiyê. Pêvajo hemû niha bi vî rengî ye ku pêş de çûye û ne jî ji ortê rabûye, em vê jî nabêjin û qebûl nakin ji ber divê aştiyek bê avakirin. Em a bi vî rengî jî tu li Rojava dijmintiya gelê Kurd bike, niha jî tu bêje em ê aştiyekê ava bikin. ev xapandineke ne tiştekî exlaqî, wijdanî ye û nayê qebûlkirin jî. Herwiha hevalên me jî wê biçin gel Rêber Apo, rêbertî jî wê daxuyaniyan bide ev jî girîng e. Ji ber tiştê îro li Rojava diqewimin Rêber Apo berê jî îşaret pê kiriye ku gotibû rêxistin, partî û tevgera Kurd berhev bin û çi pêwîst e ji bo yekîtiya Rojavayê Kurdistanê bikin, di vî alî de jî serokatî hinek kêmasî jî dîtin û anî ziman. Gelê Kurd jî bi hêz û berxwedana xwe bawer e. Pêvajo îro li gorî gelê Kurd nîne û bi vî awayî jî qet nayê qebûlkirin. Ji bo wê pêwîst e dewlet di destpêkê de destê xwe yê qirêj ji Rojava bişkîne û ji bo aştiyeke birûmet tev bigere.



## Parastina Rojava, Parastina Kurdistanê ye

Farûk Sakik

Hêzên mezin yên cîhanê, ji ber berjewendiyên xwe yên wekî enerjî, krîza koçberan û hwd, çavên xwe ji komkujiyên li ser Kurdan re digirin.
Ev bêdengî, ji dewletên ku dijminatiya Kurdan dikin re di qada navneteweyî de meşrûbûneke çêdike.
Dema ku van hêzan li Rojhilata Navîn amadekariya tevlîhevkirinê dikirin, li maseyek rûniştin û planek nû dane pêş xwe. Lê li ser vê masê Kurd tunebûn.
Wan li ser qedera Kurdan bê ku bi Kurdan bişêwrin biryar didan. Tirkiye jî bi dosya “krîza koçberan” li masê rûniştibû.
Li ser israr û pêşniyara Tirkiyê dixwestin Kurd di statuya xwe ya sed salî berê de bimînin. Dixwestin di guhertina sînorên Sykes-Pîcota îro de, Kurd di pozisyona xwe ya sed sal berê de bimînin. Deskeftî û statuyên wan yên wek Rojava û Başûrê Kurdistan ji holê were rakirin.
Çîroka Rojava jî ji vê derê dest pê kir.
Li hemberî Kurdan şerek topyekûn yê îmhayê dane destpêkirin. Ev şer ji Helebê bi êrişa 2 taxên giraniya wan Kurd bûn; Şêxmeqsûd û Eşrefiye dest pê kirin. Bi vê êrişê re rûyê wanê dijminatiyê hêdî hêdî zelal dibû.
Kurdan stratejiya wan ya şer a li ser bêbextiyê hatibû hûnandin, dereng ferq kirin. Ji Rêber Apo di rojên tecrîdê de bû. Dema ku heyet çû Îmrali li Helebê komkujî destpêkiribû jî. An jî dikaribû midaxale bike û stretajiya wan a qirker, vala derxe.
Dema desteya rêveberiya xweser a demokratîk derbasî Şamê bû, stratejiya xwe ya nû xistibûn meriyetê.
Li Şamê soz û sondê didan, di pratîkê de pêk nedihat. Berevajiyê wî dema QSD li gor hevdîtinan-lihevkirina paşve vedikişiya, ew û çeteyên xwe dest bi komkujiya sivîlan dikirin.
QSD bêbextiya wan li Hesekê da seknandin. Êdî li sînorê heremê Kurdan bûn. Ev herûm diviya bihata parastin û wan jî parast. Dema ku şervan li derveyî bajêr ev êrîş dida seknandin, li nav bajarde herkes bi rihê seferberiyê di nobeda parastinê de bûn.
Dema li Rojava ev berxwedan û parastin dewam dikir, seferberiya hatibû îlankirin li Kurdistan û li dîaspora deng veda. Geşedanên ku îro li Rojavayê Kurdistanê diqewimin, ne tenê guherînên siyasî, yan jî leşkerî yên herêmî bûn; ev rûbirûbûneke dîrokî ya hebûn û tunebûna gelê Kurd bû.
Kurdan dizanibû,Rojava îro bûye dilê berxwedanê û neynika paşeroja wan. Herkesî baş di zanîbûn, Rojava xewnên wan yên azadiyê ne.
Ji bo vê yekê, bi milyonan Kurd, Kurdistanî û dostên wan li qadan bûn. Meş mitîng û çalakiyên wan, sînerjiya yekitiya netewî afirand. Têkoşîna salan ku rihê neteweyî bi Kurdan dabû avakirin, berê wan dabû eniya parastina Rojava. Di encama van têkoşînan de, di 30’ye Çilê de bi lihevkirinek bi Şamê re, parastina Rojava derbasî merhaleyeke nû bû.
Di demek wiha de şerê taybet ket dewrê. Deng û dîmenên yekîtiya neteweyî di serî de Tirkiye gelek aliyan ne rehet kiribû û tirsandibû. Hin kes ketin nav hewldanan ku ew sînerjiya qadan a ‘yekitiya neteweyî’ berteraf bikin.
Nikaribûn midaxele bikin lê trolên xwe û hêzên Kurdan xistin dewrê.

Kurd heger xwe bi rêxistin nekirina, wê di nav bahozên siyasî yên Rojhilata Navîn de her tim bêparastin û bêstatu bimana. Dijminê gelê Kurd dixwazin ku bi leyîzkên şerê taybet di nav Kurdan de parçebûnek çêbikin.
Bi ked û bedelên mezin, Kurd bûne xwedî nasname. Bi vê nasnameyê hîsên netewî li wan peydabûn û bi vî hîsî li qadan Rojava parastin. Wan baş dizanibû; Parastina Rojava, parastina Kurdistanê ye.



# Hunermend û rojnamevanên Kurdistanî: Erka hunermendan ji bo Rojava erkeke mirovî û dîrokî ye

**Hunermend Diyar Dêrsim, Şemdîn û rojnamevan Kakşar Oremar dan zanîn ku êrişa li ser Rojava komployek bû û gotin, “Erka hunermend û rewşenbîran ji bo Rojava erkek mirovî û dîrokî ye. Yekrêziya ku çêbû, destkefiyeke mezin e ji bo xwedîderketina şehîdan e. Koma Berxwedan wê ji bo Rojava xebata hunerî bike.”**

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Di hemû waran de Rojavayê Kurdistanê ji berxwedaniya Şêxmeqsûd û Eşrefiyê heta roja îro di seferberiyê de ye. Li seranserî Kurdistan û cîhanê destek dane gelê Kurd li Rojava, di çarçoveya vê piştgiriyê de şandeyeke hunermend û rewşenbîrên Kurdistanî di 31’ê Çile de hatin Rojava, endamên vê şandeyê hunermend Şemdîn, Diyar Dêrisim, rojnamevan Kakşar Oremar û hwd… bûn. Derbarê rewşa Rojavayê Kurdistanê, hatina vê şandeyê û tevlîbûna hunermedn û rojnamevanan ji bo piştevaniya Rojava, hunermend Diyar Dêrsim, Şemdîn û rojnamevan Kakşar Oremar ji rojnameya me re axivîn.

**‘Êrişa li ser Rojava komployek bû’**

Diyar Dêrsim destnîşan kir ku êrişa li ser Rojava komployek bû wiha bi lêv kir: “Êrişên li ser Rojava, ne êrişên ji rêzê ne, lê belê pir hesab û pir aliyên wê hene, di Rojhilata Navîn de hêzên hegemon dixwazin vê herêmê li gorî xwe dîzayn bikin. Tevgerên Kurd hesabên hêzên emperyal û dagirker xerab dikin û li pêşiya van pilanan dibin asteng. Bi taybet hişmendiya Rêber Apo bûye hedef, felsefeya Rêber Apo ya sosyalîsta hemdem a ku jiyana komînal esas digre. Felsefeya Rêber Apo ji bo siberoja gelan hêviyê dide, ev proje jî bûye cihê metirsiya hêzên hegemon ên serweriya Rojhilata Navîn dikin, ji ber vê yekê jî dixwazin vê paredîgmayê têkbibin. Rewşa ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibe, rola Israîl û tevgera wê ji bo bidestxistina ewlekariyê, aliyê din jî armancgirtina Îranê ye, lê armanca kûr têkbirina felsefeya Rêber Apo ye, hêzên serwer dixwazin bi kevirekî çar pênc çivîkan bikujin. Ji ber vê yekê êrişên ku li ser Rojava çêbûn komployek bû û pêkanîna şerê îdiyolojîk e.”

**‘Erka hunermendan ji bo Rojava erkeke mirovî û dîrokî ye’**

Hunermend Diyar Dêrsim tekez kir ku erka hunermend û rewşenbîran ji bo Rojava erkek mirovî û dîrokî ye û wiha bi dawî kir: “Di dema heyî de em di rojên dîrokî re derbas dibin, rojnamevan gerek e karê ragihandinê bike û heqîqetê ragihîne, hunermend jî bi destekî tembûrê bigire û destê din rahêje çekan ji ber ku çete û hov bêserûber êrişî gelên me dikin. Ji ber ku gel li hunermendan guhdar dike, eger pêwîst bibe, dikare li çeperên şer di nava şer de li kêleka gel stranan bêje. Li Rojavayê Kurdistanê em îro dibînin hemû hunermendên Kurd rahiştine çekan, erkê her pêkhateyekî civakê ew e ku parastinê bike, eger aliyek dagirtî be û aliyê din kêmasî tê de hebin ew ê seqetbûn derkeve holê. Divê her kes hişyar be û xwe berpirsyar bibîne, em dibînin ku li Rojava rojnamevan, rewşenbîr, hunermed, nivîskar, civak bi keç, xort, kal, zarok, mezin û her kes di tevgerê de ye, ev yek jî berxwedaniyeke pir mezin e. Ev destkeftiyên ku hatine bidestxistin tev bi saya xort û keçên wêrek û dilsoz hatine girtin. Da ku em bi rûmet bijîn xwedîderketina li van destkeftiyan, xwedîderketina li xwîna şehîdan e. Hunermend û rewşenbîrên Kurd xwedî wê erkê û berpirsyariyê ne ku bîr bibin, bi gelê xwe re bin, wan hişyar bikin, ev erk jî erkeke mirovî û dîrokî ye.”



Diyar Dêrsim

**‘HTŞ’ê bi xeyalên xwe xwest xwe bigihîne Dêrikê’**

Kakşar Oramar da zanîn ku HTŞ’ê di xeyalên xwe de dihizirî ku xwe bighîne Dêrikê û wiha got: “Îsal salvegera 80’emîn a Komara Kurdistan bû, li ser daxwaza Genêral Mezlûm Ebdî û Zanîngeha Rojava ku xebatek were lidarxistin û me yê bi vê boneyê bi çapkirina elbom û pirtûkên girêdayî dîroka Komara Kurdistanê pîroz bikiraya. Ev yek jî bi beşdariya Mela Pêşawa Qazî Mihemed û çend rewşenbîrên Rojhilatê Kurdistanê wê pêkbihata. Lê ji ber rewşa tevlîhev a ku Rojavayê Kurdistanê tê re derbas dibe, ev xebat pêknehat. Sedem jî ew bû ku çeteyên hikumeta Colanî êrişî Rojava bikin, cîhadîstan û çeteyên HTŞ bi xeyalên xwe dixwestin bigihêjin Dêrikê, lê yekrêziya Kurdî ji van êrişan re bû keliheke berxwedaniyê û xewnên wan cîhadîstan têkçûn. Zêdeyî 10 rojan bû ku şandeya me ya hunermend û rewşenbîrên Kurdistanî li Başûrê Kurdistanê bû, me gelek hewldan dikirin ku em werin, lê ji ber şer û tevlîheviyan, hikumeta Başûrê Kurdistanê derfet nedida ji ber ku em welatiyên Ewripî bûn, berpirsiyariya ewlehî ji vê yekê re heye. Lê ji ber ku em xwedî israreke mezin bûn, em hatin Rojava. Axa Rojava ya ku me piyên xwe daniye ser, axeke pîroz e, ji ber ku bi xwîna hezarên şehîdan hatiye avdan. Bi saya şehîdan şoreş dest pê bûye, temenê vê şoreşê bûye 15 sal, hin kêmasî di warê erkdariya şaredariyê û xizmetguzarî de hene, lê sazîbûyîn û pêşketina hişmendiyê heye, eger derfet çêbibe ew ê mîna Başûrê Kurdistanê pêşketin di her hêlî de çêbibe.”



Kakşar Oremar

**‘Yekrêziya ku çêbû, destkefiyeke mezin e ji bo xwedîderketina şehîdan’**

Rojnamevan Oramar diyar kir ku hevrêziya Kurdî bû destkeftiyek li hemberî 14 hezar şehîdên Rojavayê Kurdistanê û wiha bi dawî kir: “Niha Rojava hişt ku Kurdên her çar parçeyan bibin yek. Vê carê me tekez kir ku ew ê dîsa tu kes mîna Sayks û Pîkot wê ji dawiya cîhanê neyên û bi qedera me bilîzin, em nebûn amrazek di destên Amerîka de ku biçin şerê Heşd Elşeibî û çeteyên DAIŞ’ê bikin, di heman demê de em nebûne dijminên xwe. Niha Rojava li hemberî çeteyan ji Başûrê Kurdistanê û Bakur re bûye keleheke parastinê, ji ber vê yekê destekdayîneke mezin ji aliyê Başûrê Kurdistanê ve ji bo gelê Rojava pêkhat. Em dibînin ku sînor di nabera Kurdan de neman, Kurdên diyasporayê xwedî roleke diplomatîk bûn. Rojhilatê Kuridistanê tevî rewşa wê ya aborî ya xerab destekdayînê dide Rojava. Dibe ku Rojava ne hewcedarê piştevaniya Rojhilat, Kurdên diyaspora, Rojhilat û Başûr be, lê ev piştgirî, xwedî nameyên siyasî, hunerî, civakî û dozdariya rakirina sînorên sedsalî bin. Em spasiya dîktator û cîhadîstan dikin ku bi vê nezanîbûna xwe hiştin Kurd bibin yek.”

**‘Rojavayê Kurdistanê rihekî netwperwerî di nava hemû Kurdande çêkiriye’**

Hunermend Şemdîn anî ziman ku Rojavayê Kurdistanê rihekî netewperwerî di nava tevahî gelê Kurd de afirandiye û wiha domand: “Em gelekî kêfxweşin îro em li Rojavayê Kurdistanê ne em hemû dizanin cihê berxwedanê ye îro rihekî gelekî netewî di nava Kurdan de çêkiriye. Ji her çar hêlên Kurdistanê şandeya hunermend û rewşenbîran ji Ewropayê hatin Rojava. Cara yekê ye em bêjin hem Ewropa hemû derên dunyayê Kurd ewqasî xurt grse rabûn li ser piyan rihê netewî çêbûye di nava gelê Kurd de hem sîror ji holê rakirin hem jî hemû partiyên Kurdan neçarî yekîtiyê kirin. Ji ber vê jî berxwedana Rojavayê Kurdistanê parçê Kurdistanê yê herî biçûke, lê rihekî berxwedanê mezin di nava gelê me de çêkiriye. Li ku derê şer qewimî ye serhildan çêbûye şer çêbûye keç û xortên Rojavayê Kurdistanê hemû derên Kurdistanê de bedel dane şehîd bûne keda wan heye. Ev du roj in em li vê derê ne, em di nav gelê xwe de ne û me serdana dezgehên ragihandinê hem malbatên şehîdan, saziyên çandê, şaredarî û hwd…”



Şemdîn

**‘Koma Berxwedan wê ji bo Rojava xebata hunerî bike’**

Hunermendê Kurdistanî Şemdîn eşkere kir ku Koma Berxwedan ji bo têkoşîna Rojava stranan çêbike û wiha bi dawî kir: “Berî niha di sala 2012’an de em hatine Rojava, lê bi awayekî veşartî bû, wê demê em ji bo Newrozê hatin, hinek xeterî hebû ji ber tirsa ji teqînan Newroz hat betalkirin.Îro em gelek kêfxweşin wek hunermend ku di nava gelê xwe de ne li Rojavayê Kurdistanê ne. Belê vê gavê hevalên me yên hunermend yên endamên Koma Berxwedanê hewil didin strana çêkin bi taybetî li ser berxwedana Rojavayê Kurdistanê ew erka hemû hunermendan e hunermend derd, êş û kulê gelê xwe anha di bedena xwe de hîs dikin û erka wan e ku strana çêkin ji bo gel, ji ber stran jî moralê dide civakê stran jî hestên civakê xurt dike û bilind dike hemû hunermend bi taybet Koma Berxwedan wê di warê hunerî de bixebitin. stranên min li ser Rojava jî hene hinek stranên min hene ketine ser zimanê milet yek jê strana (Ev e Dunya Pir Mezin e Têra Me Hemiya Heye) gelek stranên me hene bûne malê gel em bêjin gelek hevalên din jî wek strana Xelîl Xemgîn a (Îro Çerxa Şoreşê Felek Digerîne) li ser zimanê milet e coşekê, rihekî û moralekî çêdike huner jî gelekî rolekê dilîze.”

## Têbînî



## Dem Hatiye Saziyên Rewşenbîran Bibin Yek… Sibe Dereng e

Kemal Necim

Ji ber gelek sedeman, di salên derbasbûyî de li Rojavayê Kurdistanê çend yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran bi navên cuda hatin damezrandin. Her çiqas naveroka çalakiya van yekîtiyan û şêwaza wan a karkirinê nêzî hev e û li erdnîgariyeke nêzî hev dixebitin jî, lê ev zêdebûna hijmara van saziyan û dabeşbûna wan bûye sedema dabeşbûn û belavbûna xebatên çandî û rewşenbîrî û di encamê de nikarîn qadeke têkoşîna çandî ya bi bandor ava bikin, herwiha nikarîn bibin hevpar û piştgirên bi bandor di kargêrî û têkoşîna gelê Kurd ya siyasî û civakî de.
Di salên dawiyê de çend pêşniyar û hewldanên ji bo yekkirina van saziyan derketin pêş, lê ji ber ku hin ji van yekîtiyan girêdayî hin aliyên siyasî ne, lewma biryara wan di destê wan aliyan de ye, ji ber wê yekê ev hewldanên yekîtiyê negihiştin ti encamê.
Sala 2025`an, piştî hilweşîna rejîma Baas`ê û guhrtina rewşa giştî li Sûriyeyê, hewldaneke din a yekkirina yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran çêbû. Di encama wê hewldanê de meha Adarê dîdareke giştî ya hemû yekiriyan hat lidarxistin, pêşniyar hat kirin ku hemû yekîti werin betalkirin û banga konreyeke giştî were kirin da ku saziyeke yekgirtî were avakirin, lê dîse encameke bi bandor derneket, dîse vîn û daxwaza yekîtiyê li ba hin saziyan tune bû. Weke ku ev yekîtî bixwazin ji vê erka sereke birevin tiştek bi navê Desteya Hevbeş ya Nivîskar û Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê hat avakirin. Ezmûna vê desteyê ya salekê ne bi hêvî bû û nebû platformeke karekî hevbeş ya bi bandor. Li şûna wê ew deste bû desteya çend kesan û weke saziyeke cuda kar û xebat kir û rewşa dabeşbûnê hîn zêde kir.
Bê guman, di rewşa heyî de, piştî ezmûna zêdetirî 15 salan, pir diyar bû ku dabeşbûn, belavbûn û parçebûna yekîtiyên rewşenbîran bûye sedema lawazî û qelsbûna qada rewşenbîrî, ev lawazî êdî pir diyar û xuyaye. Lê gelo wê sûd û bandora yekirina yekîtiyên çandî hebe? Yekkirina yekîtiyên çandî û rewşenbîrî dikare bibe stûnek bingehîn ji bo xurtkirina nasnameya neteweyî û çandî û bihêzkirina hevgirtina civakî bi rêya çalakiyên hevbeş û hewildanên afirîner û parastina mîrateya çandî.
Ev yekbûn dê bibe alîkar ku xebata çandî hîn bêhtir çalak bibe, danûstandina rewşenbîrî kûrtir bibe û gotareke rewşenbîrî ya yekgirtî pêş bikeve.
Di çend hefteyên dawiyê li Sûriyeyê û Rojava guhertinên pir mezin û bi bandor çêbûn, pir diyar bû ku hêza sereke ya parastina nasname, ziman û hebûna Kurdan, yekîtî û hevgirtina wan e. Li gorî van geşedanên dawiyê, dê di demên pêş de roleke pir girîng bikeve ser milê rewşenbîran. Ji bo parastina nasnameya çandî ya gelê Kurd li Sûriyeyê pêdivî bi hewldanên yekgirtî heye, herwiha pêdivî bi gotareke rewşenbîrî ya resen û bi hêz heye ku karibe bi çandên civakên cuda yên Sûriyeyê re hemahengî û danûstandineke şaristanî pêk bîne.
Li gorî van mercan, niha ji her demê bêhtir pêdiviya nivîskar û rewşenbîrên Kurd bi sazîbûneke yekgirtî, bi hêz û bi bandor heye. Lewma dem hatiye ku yekîtiyên rewşenbîran bi wêrekî û vîn û biryar tevbigerin, banga kongreyeke berferh ya hemû rewşenbîr û nivîskarên Rojavayê Kurdistanê bikin û saziya xwe ya yakgirtî ava bikin.

# Ji bo çareserkirina kêmbûna nan tedbîr hatin girtin

Hevserokê Komîteya Firneyan ya kantona Cizîrê Rondar Salih tekez kir ku hemû nangehên li herêmê di ximzetê de ne û bi awayekî domdar dixebite bêyî sekinandin û got, “Tevî êrişan me karîbû nan ji bo gel û koçberan dabîn bikin û aloziyê derbas bikin.”

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di dema dawî de êrişên li ser gelê Kurd û Rojavayê Kurdistanê gihaşt astek pir bilind, di encama van êrişan de bi hezaran ji gelê Kurd ji herêmên cuda ji Şêxmeqsûd û Eşrefiyê heta Tebqa, Reqa û Dêrazorê, neçar man ku koçber bibin û piraniya wan berê xwe dan bajarê Qamişlo..

Di destpêka pêlên koçberiyê de gelek alozî derketin pêş, di nav de aloziya peydakirinan nan bû, hem ji bo koçberan hem jî ji bo şêniyên herêmê, di vê çarçoveyê de, Komîteya Nangehan ya kanatona Cizîrê hewil da ku rê li ber kurbûna aloziyê bigre û pirsgirêkên ku derketine çareser bike.

Derbarê mijarê hevserokê komîteya nangehan ya kantona Cizîrê Rondar Salih ji rojnameya me re axivî.

### Rewşa nangehan bi giştî

Rondar Salih diyar kir ku niha hemû nangehên herêmê di xizmetê de ne û bi awayekî domdar dixebitin û wiha got: “Hejmara nangehên giştî ku niha di xizmetê de ne 17 firne ne, di heman demê de 150 firneyên nîvtomatîk jî dixebitin bi piştgriya temwînê. Ev firne ji seatên berê zêdetir dixebite da ku karibe nan li komînan belav bikin, di heman demê de ji bo pêşkêşkerên nan yên ku li bajar, bajarok û gundan difroşin.”

Rondar Salih diyar kir ku komîteya firneyan a kantona Cizîrê firneyên zêde vekirin e ji bo vê rewşa awarte û wiha anî ziman: “Ev jî ji ber zêdebûna hejmaran koçberan li herêmê ye, zêdtirî 20 firne li bajarên kantona Cizîrê hatin vekirin, li Qamişlo 19 firneyên nîvalî hatin vekirin da ku ev rewşa heyî û zehmet derbas bikin, 2 firne li Tirbespiyê, firneyek li Girkê Legê û li Hesekê çend firneyên din hatin vekirin bi armanca dabînkirina pêwistiyên hemû komînan.”

Rondar Salih diyar kir ku ji ber hejmara zêde ya koçberan li bajarê Qamişlo gelek tedbîrên pêwîst ji bo derbaskirina vê rewşê girtine, di nav de vekirina van firneyan û zêdekirina pêwistiyên firneyan li hemû bajarên kantona Cizîrê, li gorî daxwaza bajarên ku koçber lê hene.

### Komîteyên awarte

Rondar Salih wiha berdewam kir: “Weke Komîteya Firneyan me komîteyên awarte jî ava kirin li gorî pêwistiyê heyî ku tê xwestin, komîteya awarte li ser du astan e ya yekmîn li ser asta kantona Cizîrê û ya 2‘yemîn li ser asta bajaran e. Ev Komîteyên awarte yên taybet ji bo çavdêriya kar û xebatê firneyan e ku bi awayekî rasterast dikin, dema tu pirsgirêk derbikeve têkiliyan bi komîteya navendî ya Cizîrê dike da ku destwerdanê bike û çareseiryê deyne herwiha hemahengî dike ji bo dabînkirina pêwistiyên her bajarê ku kêmasî tê de derkeve.

Di Çarçoveyê de tedbîrên ku hatin girtin yek jê endamên meclisa aborî, çandniyê û firneyan li pêşiya hemû firneyan yên taybet û giştî hatin belav kirin, ev endam karê wan çavdêriya kalîte, giraniya nan û cudahiya wê ye; dikin. Her wekî din rêxistinkirina nan û tesbîtkirina mîqdara ku ji van firneyan hatiye derxistin û gihandina wê ji bo komînan da ku pirsgirêk dernekeve. Armaca van tedbîran ew dispilînkirin û gihandina pêwistî û mîqdara nan ji bo komînan e.”



Rondar Salih behsa astengî û zehmetiyên ku li hember wan derket di destpêka koçberiyê de û wiha anî ziman: “Di destpêka rojên koçberiyê de me gelek astengî dît weke kombûna gel li pêşiya firneyan, ku ev yek hişt ku nan dereng bimîne heta ku bighêje komînan. Giliyên hin şêniyan hebûn ji ber derengbûna gihandina nan, di encamê de me ev tedbîr girtin. Di vê derbarê de û di rêya rojnameya Ronahî de em bang li şêniyan dijin ku berê xwe nedin firneyan ji ber ku ev firne tenê ji bo komînan hatiye xebitandin, bila şênî li komînên xwe vegerin ji ber ku em vê pêwistiyê li komînan belav dikin. Dîsa em tekez dikin ku ji ber aloziya li pêşiya firneyan me nikarîbû ku bighêjin nan û bighînin komînan.”

### Derbaskirina aloziya nan

Rondar Salih destnîşan kir ku piştî tedbîr hatin girtin û firneyên din hatin vekirin karîbû aloziya nan derbas bikin û got:“Di rojên dawî de gelek hewildan hatin kirin ji bo derbaskirina vê aloziyê, ji ber ku pêdiviyên komînan bi piranî hatine dabînkirin, gilî û qerebalix kêm bûye. Meclisa Bajarê Qamilşo, meclisên din ên bajêr, komîteyên awarte û hemî saziyên ku çavdêriya belavkirina nan dikin re hevahengiyek berdewam heye, bi armanca ku radestkirina wê ya dadperwer û birêkûpêk ji welatiyan re were misogerkirin.



Di gaveke din de, betlaneya heftane ya hemî firneyên giştî û taybet, tevî roja Înê hate betalkirin û seatên xebatê hatin zêdekirin, da ku hilberîna nan di vê dema krîtîk de zêde bibe.”

Rondar Salih her wekî din zêde kir ku firneyên nanê Siyahî jî bi sotemeniyê hatin dabînkirin û got: “Hemî alîkariyên pêwîst û hêsan ji wan re hatin peyda kirin da ku 24 seatan bixebitin, da ku pêdiviyên şêniyan werin dabînkirin û kêmasî çênebe.”

Rondar Salih eşkere kir ku gelek gilî û gazin hatine wergirtin derbarê bilindkirina bihayê nan ji aliyê hin aliyan ve, bi sûdwergirtina ji rewşa heyî û wiha piştrast kir: “Komîteyên çavdêriyê tavilê destwerdan kirin û her kesê ku rêziknameyan binpê kiriye hatine cezakirin, da ku aramiya bihayê were parastin û îstîsmar neyê kirin.”

### mekanîzmayek zelal û nerm ji bo koçberan

Rondar Salih li ser mekenîzmeya belavkirina nan li ser koçberan wiha behs kir: “Ji bo koçberan, firneyên taybet hatin vekirin da ku nan ji wan re di stargehan de peyda bikin, bi hevahengiya rasterast bi Komeleya Civakî ya Efrînê re, ku berpirsiyarê belavkirina nan li van navendan e. Hejmara nanên ku rojane hewce ne li gorî hejmara koçberan hate destnîşankirin û nan bi tevahî bê drav hate peyda kirin. Her wiha mekanîzmayek zelal û nerm hate danîn da ku her zêdebûna ji nişka ve ya hejmara koçberan çareser bike.”

Di dawiyê de, Hevserokê komîteya Nangehan Rondar Salih, bang li gelê kantona Cizîrê kir ku di vê qonaxa hesas de hevkariyê bi hev re bikin û pabendî mekanîzmaya belavkirinê ya pejirandî bibin û wiha got: “Ev hevkarî faktorek sereke ye ji bo pêşîgirtina li her kêmasî an binpêkirinê û misogerkirina ku nan digihîje her kesî.”



# Kesîre Onel: Em li vir in û em ê her li pey rastiyê bimeşin

Hevseroka Komeleya Rojnamegeran a Dîcle Firatê DFG Kesîra Onel da zanîn ku di binçavkirinan de ji bilî lêdan, êşkence û muameleya keyfî, rêbazên şîdeta devkî jî li dijî wan hate kirin û got, “Ji sûcên şer heta polîtîkayên sînor, ji êrişên li ser bedena jinê heta çanda talanê divê em her tiştî bi perspektîfeke herî vekirî û rast binivîsin û bikşînin.”

**Zana Roj**

Li kêlek bilindbûna dengê gelê Kurd li çar aliyên cîhanê ji bo Berxwedana Rojava, li hember gel û Rojnamevanên Çapemeniya Azad li Tirkiyê û Bakurê Kurdisatanê gelek serdegirtin, êşkence û kiryarên li dijî mafê rojnamevanan hate kirin. Girêdayî vê yekê Hevseroka Komeleya Rojnamegeran a Dîcle Firatê Kesîre Onel bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**-Hûn Rojnamegeriya azad li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê êrişên li ser Rojava çawa dinirxînin?**

Berî ku em dest bi nirxandina pêvajoya Rojava bikin, divê li ser mijareke girîng rawestin. Li ber çavên hemû cîhanê, em şahidê pêvajoyekê bûn ku tê de DAIŞ û çeteyên wê yên barbar ji axa Rojava hatin paqijkirin; pêvajoyek wisa girîng bû ku jin pêşengiya vî şerî dikir. Û piştî wî jî li Rojava şoreşa jinan pêk hat. Tam di vê demê de ku me dest bi axaftina li ser statûya Kurdan bi taybetî li Rojava dikir û herwiha di pêvajoya îmzekirina Peymana 10’ê Adarê ya bi Hikûmeta Demkî ya Sûriyê re bûn, me bi rengekî zelal dît ku bi carekê her tişt berovajî bû û êrişên tund dest pê kirin. Wek kesên ku bi salan li ser axa ku şer lê dewam dike rojnamegerî dikin,



em baş dizanin ku şer û têkçûn tê çi wateyê.

Bi destpêkirina dorpêçkirina taxên Kurdan li Helebê şer û pevçûn zêdebûn. Di encama şer de; koçberiya bi zorê çê bû, gelek kesan di nav de jin û zarokan jî jiyana xwe ji dest dan, derket holê. Êrişên hovane bûn, piştî van bûyeran tenê rêyek ma ew jî rêya ji bo gelê xwe û axa xwe têkoşîn û berxwedan bû. Me di vê pêvajoyê de rastiya têkoşîna gel dît. Divê em di van êrişan de sûcên şer ku li ber çavê hemû cîhanê tên kirin bibînin. Herwiha xala girîng jî ev e ku divê em vê rastiyê jî bibînin ku çawa polîtîkaya Tirkiyê bandorê li cîhanê dike û li dijî şer propagandaya tarî tê kirin çawa ku bandor li raya gisti ya cîhanê dike. Di vê pêvajoyê de xwestin ku têgihiştineke wisa biafirînin ji bo gelê ku bi vî şer û gotinên nefret û qetlîaman re rû bi rû bihêlin.

**-Dewleta Tirk bi tundî mudaxeleya xwepêşandanên gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê yên ji bo piştgiriya Rojava kir û hin xwepêşander û Rojnamevan birîndar bûn, hûn nîzîkatiyên dewleta Tirk çawa dibînin?**

Wek rojnamevanek ku li Nîsêbînê, yek ji xetên sînorê Bakur û Rojava ye, bi 4 hevpîşêyên xwe re dema me çalakiyan ji nêzîk ve dişopand û di vê pêvajoyê şopandinê de em bi hev re hatin binçavkirin, dixwazim bersiv bidim.

Bi provokasyona “Sînor hat şikandin û ala Tirkî hat daxistin” re, li dijî mafê herî demokratîk ê ku mafê meş û çalakiyê ye, ji aliyê hêzên desthilatdar ve êrişên herî tund û herî hov li hember xwepeşandan û hilbijêran re hatin kirin. Mînaka vê yekê jî tiştên ku li Qerakola sînor li gel ciwanê bi navê Diyar Koç, hatin kirin. Her wiha piştî van bûyeran, bi serdegirtina malan re, li endamên malbatan û kesan re muameleya xerab hat kirin; lêgerînên malan bi kûçikan ra û gelek awayên din ên ku armanca wan dûrxistina girseyê ji çalakiyan bû, hatin pêkanîn.

Tevî hemû van mudaxaleyan, gelê Kurdistanê û gelê ku li Tirkiyeyê dijîn her roj daketin qadan û çalakiyên xwe tu carî ranewestandin. Em dikarin bêjin ku hema her roj meş, konvoy û çalakiyên li qadan pêk hatin. Em bi taybetî jî di binçavkirinan de şahidê binpêkirina mafan bûn. Di binçavkirinan de ji bilî lêdan, êşkence û muameleya keyfî, rêbazên şîdeta devkî jî li dijî me hate kirin. Bi rastî em dikarin bibêjin ku Hikumetê îro ji bo ku ev bûyerên hovîtî û wahşetên ku li Rojava têne kirin xuya neke û ji bo rojava gel ne civin van êrîşan dikin. Bi vê rêyê dixwazin armanca xwe bi tirsandinê bixin bin kontrolê û di polîtîkaya cîhanê de destê xwe bihêz bikin.

DİCLE FIRAT GAZETECİLER DERNEĞİ

**-Li hemberî êrişên qirkirinê li dijî gelê Kurd li Rojava tişta dikeve ser milê rojnamevanên Rojnamegeriya azad û tevahî gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê çi ye?**

Wek ku min di nirxandinên xwe yên berê de jî destnîşan kir; li axên ku hêzên hegemon ên cîhanê ku parçe parçe kirin de, dema ku malbat, xizm ango kesekê bi qirkirinê re rû bi rû dimînin, bêguman bêdengî tê xwestin. Bi vê hêsasyetê, bi têgihiştina rojnamegeriyê ya ku armanca wê ev e ku dengê vê rastiyê bigihîne hemû gelên cîhanê em karê xwe dikin.

Di her şertî de em mecbûrin ku rastiyan bi awayekî herî vekirî û ji aliyê rastî binîvîsin û bibînin. Mînak: Ji sûcên şer heta polîtîkayên sînor, ji êrişên li ser bedena jinê heta çanda talanê divê em her tiştî bi perspektîfeke herî vekirî û rast binivîsin û bikşînin.

Di vê xebatê de, derxistina rastiyan li dijî derewan li hemû cîhanê pêşkêşkirin erk û berpirsiyariya me ye. Di nav hemû şertan de, em wek karkerên çapemeniya azad, li dijî belavbûna agahiyên ku ne rastin bi hemû hêza xwe dixebitin. Tevî hemû zordarî û polîtîkayên tirsandinê, em li vir in û emê her tim li pey rastiyê bimeşin.

**-Li dijî gelê Kurd şerê qirkirinê tê meşandin, banga we ji bo raya giştî ya cîhanê çi ye?**

Hêzên hegemon ên ku bi hişê dewleta-neteweyî tevdigerin, di avakirina sedsala nû de, dixwazin Rojhilata Navîn a nû ku ew dixwazin biafirînin û kaosa ku dixwazin çêbikin de, Rojava jî wek amûrekî siyasî bikar bînin. Li hember vê rewşê, Rojava bi rastî nîşan dide ku gel dikarin bi hev re, bi rêbazên bihêz û demokratîk, xwe birêve bibin.

Ji bo Rojava, em bang li hemû gelên bi rûmet ê cîhanê dikin. Rojava ku gelê wê bi rûmet û bi çanda xwe dijîn bi êrişan re rû bi rû dimînin. Ji bo pêşeroja gelan, em bang dikin ku bi cesareteke mezin û bi gavên girîng û çalak bi bandor tevbigerin. Di dawiyê de, em bang li Tirkiyê û hemû medyayên cîhanê jî dikin: li dijî van pêkanînên li dijî mirovahiyê, divê rûyên xwe vegerînin gelên ku li berxwe didin. Cîhan tenê bi rojnamegeriya rastî dikare van qetlîamên ku tên kirin bibîne û rawestîne.



## Îro Konsepta ser Rojava Versiyonek Komploya 15’ê Sibatê ye

**E.Pêjder Altan**

Sedema ku me vê sernavî avêt ew e ku ji ber îro heman hêz û dewlet vê komploya ser Rojava, di nav komploya navneteweyî ya 15’ê sibatê 1999’an de bi dîl girtina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan encam bibû de jî cih girtibûn. Ango îro konsepta plana li ser Rojava versiyoneke komploya 15’ê Sibatê 1999’an e. Çawa komploya 15’ê sibatê bi rihê fedayî gelê Kurd ku xwe kirin topa agir û li her derî derketin serhildanê, îro jî gelê Kurd ên li her derê Kurdistanê û dîasporayê bi dost û hogirên xwe re rabûn ser piyan û ev plana komploya navneteweyî ya li ser Rojava vala derxistin.

Çawa ku komploya navdewletî ya 15’ê Sibatê li hemberê Rêber Abdullah Ocalan hatibû kirin, îro konsepta plana fetisandina şoreşa Rojava jî li hember Rêber Apo hatiye kirin. Ji ber ku Şoreşa Rojava di xeta paradîgmaya Rêber Apo a wekheviya gelan, jiyaneke komînal, bi vîneke azad xwe bixwe birêvebirina gelan, azadiya jinê de ev 14 sal in tê meşandin. Çawa piştî 15’ê sibatê Rêber Apo pêvajoyê rast xwend û gelê Kurd ji wê kaosê xilas kir, ji darvekirinê anî ser maseyê, îro dîsa li gor daxuyaniya Endama Şandeya Îmraliyê Pervîn Buldan a “Rêber Apo mudaxeleyê vê pêvajoyê kir û hişt ev peyman were muzakerekirin” nîşaneya vê yekî ye. Ango ew plana ku gelê Kurd û Ereb bi hev bidin şerkirin û piştre jî bi tevahî li ser her du gelan komkujiyekê mezin pêk bînin.

Ji ber ku ev konseptek wiha planek ne ji rêzê ye. Îsraîl bi riya Amerîkayê di 4’ê çileyê de li Parîsê Colanî (El Şara) kirî, başûrê Suriyê ji girê Golan heya Suweyda û Derazorê di bin navê Peymana Brahîmî de girt da ku ji bo wir bike herêma riya bazirganiyê, aboriya giştî ya hêzên hegemon. Di vê navberî de ji Tirkiyeyê re jî derbasî be, lewra piştî Kurdan wê van çeteyên girêdayê Şamê (Şara) li serê Tirkiyê bikin bela.

Ji bo vê jî dema em lihevkirina dawî ya navbera şandeya Rêveberiya Xweser û Şamê de hatî kirin binirxînin, divê em li gorî vê rastiya ku me li jor anî ziman binêrin.

Armanca vê planê ne tenê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bû; Rojava wekî deriyê sereke ji bo tasfiyekirina tevahiya statuya Kurdan hate hilbijartin. Ji ber vê yekê, konsepta êrîşê ne tenê bi îradeya rêveberiyên Tirkiye û Şamê, lê bi lihevkirinek jeopolîtîk a berfireh ku DYA, Brîtanya, Fransa, dewletên Ereb û Îsraîl di astên cûda de tê de cih digirin, hate kirin. Armanc zelal bû: Kurd dê werin razîkirin ku mafên takekesî qebûl bikin, bi pêşandanên çandî ve mijûl bibin, lê hêz û statuya wan a siyasî ya rêxistinkirî dê ji holê were rakirin. Bi vî rengî, di ji nû ve sêwirandina Rojhilata Navîn de, Kurd dê careke din werin danîn ser pozîsyona objeyê, ne subjeyê.

Di vê planê de wêrankirina Rojava hebû. Ji ber ku heke Rojava bikeve, Başûr, Rojhilat û Bakurê Kurdistanê jî dê bêparastin bimînin û bi tasfiyeyê re rû bi rû bimînin. Ji ber vê yekê, êrîşa ku ji 6’ê Çile û pê ve li ser erdê dest pê kir ne “pevçûnek” asayî bû, konseptek zelal a qirkirinê bû. Agirbest hatin şikandin, peyman hatin paşguhkirin û deverên sivîl hatin hedefgirtin ji ber ku armanc ne danûstandin bû, tasfiye bixwe bû. Lêbelê, tiştek hebû ku wan hesab nekiribû: îradeya gelê Kurd. Berxwedana li Rojava tenê wekî dij-êrîşeke leşkerî nema. Li her çar beşên Kurdistanê û li dîasporayê seferberiyeke gelêrî ya hevdem derket holê. Kolan tijî bûn, partiyên siyasî helwestek hevpar girtin û beşên herî berfireh ên civakê rabûn ser piyan.

Vê zextê bandor li hevsengiyên navneteweyî kir. Paytextên Ewropî hejiyan, rêveberiya Dewletên Yekbûyî ya Amerîka neçar ma ku paşve gav bavêje û aşkere kir ku ev plan nikare berdewam bike.

Ji ber vê yekê îro peymanek tê nîqaşkirin. Dibe ku ev peyman ne serkeftinek ji bo Kurdan e, lê hişt ku plana qirkirinê paşde vekişîne. Ev cûdahî girîng e. Ev rewş ne serkeftinek e, lê şikestina plana qirkirinê ya bêveger e.

# Bikaranîna HTŞ û DAIŞ’ê di çarçoveya Rojhilata Navîn a nû de ye!

Ev geşedanên ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê re derbas dibin, hem jî êrişên ku HTŞ'ê bi piştgiriya dewleta Tirk li ser gelê Kurd dike, beşek ji lîstoka nexşerêya Rojhilata Navîn e. Di vê nexşerêya nû de HTŞ û DAIŞ'ê bûne lîstok ji bo gurkirina tevlîheviyê û pêkanîna berjewendiyên hêzên hegemon.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**




**Piştî qelsbûna Hemas, Hizbullah û rûxandina Baas senaryo dest pê kir**

Piştî ku Hemasê di 7’ê Cotmehê de êrişî Israîlê kir, pilana guhertinê dest pê kir. Destê Israîl û Tirkiyê bi rengekî veşartî di vê êrişê de hebû. Israîl bi lez gav ji bo pêkanîna armancên xwe diavêtin, lê Tirkiyê hêdî hêdî gav avêtin. Israîl bi lez Hemas bêbandor kir, hem jî piştgira wê (Hizbullah û Îran) lawaz kir, serokê Hizbullahê Hesen Nesrellah bi pêvajoyeke hestyar û îstratejîk di sala 2024’an de kuşt. Piştî kuştina Hesen Nesrellah êdî bi biryareke navdewletî bi piştgirya Amerîka û dewleta Tirk a dagirker HTŞ’ê kete liv û lebatê, rêjîm hate rûxandin, Beşar Elessed reviya da ku Colanî li şûna wî bigire. Di roja îro de hikumeta HTŞ’ê, kuştina Durziyan, Elewî, Kurdan, êrişa li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, hem jî êrişên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û qirkirina gelê Kurd weke serkeftinekê bi nav dike. Lê ji bîr kiriye ku wê başûrê Sûriyê bi temamî kiriye diyariyek û ji Israîlê re pêşkêş kiriye. Israîl îro dixwaze ji bo siberojê êrişî Heşdî Elşeibî bike da ku hin bi hin nêzî Îranê bibe û wê bike dorpêçê. Ev yek kete meriyetê de piştî civîna Parîsê a 4’ê Çileyê ku di navbera Sûriye, Israîl û Amerîka de, li dar ket.

**Hevgirtina hêzên li dijî hev ji bo beravêtina çareseriyê**

Amerîka dixwast ku QSD’ê bixe vê lîstokê da ku êrişî Îran û hêzên Heşd Elşeibî bike, ne ku têklî di navbera QSD û Îran heye, lê belê QSD’ê xwedî proje ye, ew derveyî sînorê Sûriyê nalive û êrişî hêzên derveyî sînorê xwe nake, hem jî nakeve lîstokên hêzên navdewletî yên ku li ser hesabê xwîna gelan berjewendiyên xwe pêktînin. Ji ber vê yekê êrişeke mezin li ser QSD û gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê hat kirin. Erêkirina vê êrişê di civîna Parîsê de pêkhat. Wekî tê zanîn di bîrdoziya gelê Kurd û QSD’ê de aştî û diyalog rêgezên bingehîn in. Gelê Kurd û hêza wê QSD’ê daxwazkarên aştî û lihevkirinê ne, çendîn car li Bakur û Rojhilatê Sûriyê doz ji bo lihevkirina siyasî û leşkerî dane meşandin, ev yek di serdema rêjîma Baas û serdema hikumeta HTŞ’ê de jî bûye. Lê hêzên hegemon ên weke Tikiyê, Îran, Israîl û Amerîka bûne rêgir ji riya çareseriyê re, wan riyên çareseriyeke mayinde girtine û xetimandine. Ev hêzên serdest tevî ku dijminên hev in jî, lê dijî projeyên derveyî xwe rabûne û xwe kirine yek dest. Ji bo van hêzan ne derd e ku çi bi serê gelan were, eger koçber bibin an bên kuştin an jî rastî komkujiyên mezin werin, lê belê berjewendiyên wan ji her tiştî girîngtir in, derdê wan pûçkirina şoreş û gelan e. Ev hevgirtin li ser hisabê gelan e, lê gelê Kurd vê yekê li ser xwe qebûl nake, ew ê Kurd li ber xwe bidin mîna şoreşên serdemên bûrî, ji şoreşa Kawayê Hesinkar heya şoreşa roja îro û ya siberojê.

**DAIŞ bûye faktora tevlîhevî û pêkanîna armancan**

Piştî têkçûna DAIŞ’ê li ser destê Kurdan bi hêza QSD, bi taybet şikandina baskên wê li Kobanê, hem jî rizgarkirina Reqa, Tebqa û Dêrazorê, êdî DAIŞ bê rol ma. DAIŞ’ê tenê bi şaneyên xwe tevdigeriya, dema dewleta Tirk dixwest armanceke xwe pêk bîne, hem jî siyaseta Amerîka hinekî qels dibû, şaneyên DAIŞ dikirin nava liv û tevgerê de. Bi terzê istixbaratî çeteyên DAIŞ’ê zindî dikirin, ev yek jî bi riya şaneyên veşartî. Rewş piştî serkeftina Baxozê wiha dewam kir heya ku rêjîma Baas têkçû. Piştî têkçûna rêjîma Baas, Hêzên Hevpeymaniya Navdewletî hikumeta HTŞ’ê tevlî xwe kir, qaşo ji bo meşandina şerê li dijî DAIŞ’ê. Pirs ev e! gelo Hêzên Keoalisyonê nizane ku HTŞ di bingeha xwe de DAIŞ’e? Belê ji her alî bêtir dizane, lê berjewendiyên Hêzên Hevpeymanî di vê yekê de hene. Hem jî Israîl, Qeter û Tirkiyê wê sûdê ji DAIŞ’ê werbigirin. Israîl wê DAIŞ’ê ji bo tunekirina kembera Şîayê û Îranê bi kar bîne, em dinêrin nêzbûna Israîl ji Îraqê tenê armancek jê heye, ew jî ku çawa Israîl Îranê hin bi hin di hundirê sînorê wê de bifetisîne. Îraq ji nêzbûna DAIŞ’ê û çeteyên HTŞ’ê bi tirs e. Pisporê Ewlehiyê yê Îraqê Heysem Xezelî da diyarkirin ku rewşa ewlehiyê ya li Sûriyê ku bi lez xirab dibe, bandorek cidî li ser hin komên çekdar yê li Iraqê dike. Her binpêkirinek yan destbiserdegirtinek li ser saziyek hestiyar wek girtîgeh yan jî kampan çêbibe, wê bikare pêşî li belavbûna pêlek nû ya terorê veke. Ev jî wê gefê li ewlehiya netewî ya Iraqê bixwe. Ketina çekdarên Colanî ya nava girtîgehên Sûriyeyê ku DAIŞ’î tê de ne, herwiha Kampa Holê bûye sedemê berdana bi hezaran çeteyên metirsîdar. Ev kes metirsiyek rasterast li ser ewlehiya netewî ya Iraqê û herêmê bi giştî çêdike.” Dewleta Tirk li milê din jî dixwaze sûdê ji van çeteyên DAIŞ yên ku ji zindanên Rêveberiya Xweser reviyane û tevlî artêşa HTŞ’ê bûne, li dijî Kurdan bi kar bîne, ji vê yekê jî projeya Kurdan tune bike û li ser wan komkujiyan pêkbîne.

**Kurd bêmaf bimînin wê nexşerêya Rojhilata Navîn a nû bişewite**

Rast e li Rojava projeya Kurdan di xeteriyê de ye, lê Kurdên hemû parçeyên Kurdistanê û gelê Kurd li her welatekî cîhanê piştgiriyê didin Rojava. Sedem ji vê piştgiriyê ew e ku gelê Kurd li Rojava xwedî maf e, û neteweyeke resen e, bi hezarên salan li ser vê erdnîgariyê jiyaye. Ji destpêka avabûna Sûriyê ve ev netew di warê siyasî, civakî, aborî û hwd rol û pêşengtî kiriye, lê li hemberî vê yekê hatiye paşguhkirin. Nexasim di serdema 21’ê de bi destpêkirina pilanên hêzên hegemon ên cîhanî (Pêkanîna nexşerêya Rojhilata Navîn) û kirîza Sûriyê. Gelê Kurd xwedî proje bû, projeya Kurdan Neteweya Demokratîk bû bi pêşengtiya Rêveberiya Xweser û QSD’ê hat rêvebirin. Ji ber ku ev proje li dijî planên hêzên serwer yên weke Amerîka, Israîl û Tirkiyê ye, bû hedef. Bi sedema gurkirina eşîrên ereban ji hêla dewleta Tirk a dagirker ve fitneyek çêbû encama wê jî gelê Ereb bi vê yekê hatin xapandin. Ev ne mijara me ye!. Mijara me ew e ku îroj gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê rabûne ser piyan, li kêleka vê yekê li diyaspora xwepêşandan û xebata diplomatîk dikin. Kurdistan dilê Rojhilata Navîn e, eger pilaneke wiha ku bêyî mafê gelê Kurd ê siyasî, civakî, erdnîgarî û dîrokî, çandî û xwerêvebirinê, were kirin û Kurd ji Rojhilata Navîn a nû bikevin, hem jî berjewendiyên wan neyên parastin wê nexşerêya Rojhilata Navîn bişewite. Di dema heyî de pêvajoyek li Bakurê Kurdistanê tê birêvebirin, eger Rojava gefên ji wiha mezintir bixwe wê Tirkiyê bi agirê berxwedaniya gelê Kurd bişewite û rastî parçebûnê were. Di heman demê de li Îranê xwepêşandan hene, derfeta şoreşa çekdarî li pêşiya gelê Kurd li wê parçeyê heye, ew dikarin kaxez û planên nexşerêya Rojhilata Navîn tevlîhev bixin, eger gelê Kurd li Rojava bikeve bin xeteriya qirkirinê; başûrê Kurdistanê jî îro bi hemû hêza xwe amade ye ku parastina Rojava bike. Di roja îro de tevahiya gelê Kurd li Rojava civiyane, berxwedaniya Kurdan pilanên hêzên hegemon û çeteyên HTŞ’ê vala derxistine. Ji ber vê yekê ev hêz li xwe vegeriyane da ku êrişan li ser gelê Kurd bidin hêlekê. Ji ber ku du rê li pêşiya van hêzên hegemon mane, yan wê pilanên wan bikevin xeteriyê ji ber domdariya berxwedaniya gelê Kurd û dibe ku pilanên wan têkbiçin, yan jî wê Rojhilateke Navîn a nû çêbibe û tê de wê mafê gelê Kurd parastî be û wê tê de Kurd xwedî proje û statûbin.





# Zêdetirî 7 hezar malbet ji koçberên Efrînê ji Tebqa û Reqayê koçber bûne

Bi êrişa hikumeta demkî li ser Tebqa û Reqayê zêdetirî 7 hazar malbet ji koçberên Efrînê ku li wir bi cih bibûn, berê xwe dan kantona Cizîrê û di dibistan, mizgeft û saziyan de dimînin.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Piştî êrişa çeteyên hikumeta demkî li ser Tebqa û Reqayê zêdetirî 7 hezar malbet ji koçberên Efrînê ku di dibistan û kampa Tebqa û Reqa de diman neçar man ku berê xwe bidin kantona Cizîrê û di dibistan û mizgeftan de bi cih bûne.

**Gelek caran di êşa koçberiyê re derbas bûn**

Gelê Efrînê ji ber êrişên dewleta Tirk a dagiker û çeteyên pê ve girêdarî di 18’ê Adara 2018’an de bi dare zorê ji bajarê xwe koçber bûn û berê xwe dan herêma Şehbayê a girêdayî Helebê. Bi hêviya vegera li ser xaka Efrîn, 7 salan gelê Efrînê jiyana xwe li Şehbayê di nava dorpêç û zehmetiyan de derbas kirin. Lê piştî êrişa îeteyên dewleta Tirk li ser Şehbayê koçberên Efrînê dîsa neçar man ku di 1’ê Kanûna 2024’an de koçber bibin û berê xwe bidin herêmên Rêveberiya Xweser da ku li cihek ewle jiyana xwe berdewam bikin. Piştî êrişên 6’ê Çile yê li ser taxa Şêxmrqsûd û Eşrefiyê gelek malbet ji wê derê jî koçber bûn û berê xwe dan Tebqa û Reqayê. Piştî koçberiya ji Şehba hin ji gelê Efrînê berê xwe dan kontona Firatê û hin jî çûn konatona Cizîrê. Piraniya koçberan cihê xwe di kampan û dibistanan de girtin. Di bajarê Reqayê de gelê Efrînê di dibistana de bi cih bûn herwiha li Tebqa di Kampa Azadî û Aştî de bi cih bûn û beşek jî di kampa Newroz a bajara Dêrikê de bi cih bûn.

Di 18’ê Çileya 2026’an de çeteyên hikumeda demkî a Sûriyê bi alîkariya hin êlên ereb û şaneyên veşartî êrişî Tebqa û Reqayê kirin. Ji bo vê jî gelê Efrînê herwiaha hin ji gelê Kobanê, Serêkaniyê, Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ku li wan herêman diman neçar man ku berê xwe bidin kantona Cizîrê û li wê derê di dibistan, akedemî, sazî, mizgeft, dayîngeh, baxçeya zarokan û hwd... de bi cih bibin.

Li gorî agahiyên ku Rojnameya me ji desteya Karûbarên Koçberan a herêma Efrîn û Şehbayê girtine:

**Hejmara malbetên Efrînî ku ji Tebqa û Reqa koçberî kantona Cizîrê bûne wiha ne:**

Li Amûdê nêzî 400 malbet
Dêrik 1600 malbet
Tirbêspiyê, Girkê Legê û Rimêlan nêzî 350 malbet
Qamişlo zêdetirî 5 hezar malbet e




**Rêveberiya Xweser û Rêxistinan ku bi koçberan re bûne alîkar**

Rêveberiya xweser pêwîstiyên jiyanî, mazot, sobe, isfinc herwiha pêdiviyên xizmetî li ser koçberan belav kirin.

Rêxitinên ku bi koçberan re bû ye alîkar, YN, Rojava, Car, Ektat, Bilomand, Hene, Xêrxwaziya Berezanî, Rêxistina bijîşkên Cîhanî, Rêxistina koçberên navnetewî û hwd. Herwiha hin ji ciwanên kantona Cizirê weke insiyatîfên kesayetî bi koçberan re dibin alîkar.

**Pêwîstî û daxwazên koçberan**

Di dema niha de û di rewşa zivistanê de pêwîstiyên koçberan bi gelek tiştan heye, jiyana di dibistnan de zehmet e û pîwistî bi cihên guncwa ji wan re heye, wê di demên pêş de dibistan werin vekirin wê demê wê rewşa van koçberan çawa be? Herwiha di milê xizmetê û pêdiviyên jiyanê de gelek amûr pêwîstin. De heman demê de hin zarok û kesên bi temen mezin nexwaşin pêwistiya wan bi derman û xizmeteke taybet heye. Rewş zehmete hejmara koçberan zêde ye pêdivî bi gelek tişatan heye.

# Nexweşxaneya Gel a Qamişlo pêdiviyê koçberên nexweş pêk tîne



**Solîn Mihemed /Qamişlo**

**Rêveberiya Nexweşxaneya Gel a Qamişlo Meyîsa Meter diyar kir ku ew di hemû warî de û ji bona dermankirina koçberên nexweş dibin alîkar.**

Nexweşxaneya Gel a Qamişlo ew jî di vê rewşê de bûye yek ji rêxistinan ku alîkariya koçberan û dermankirina wan û ji hemû milî ve alîkarî pêşkêşkirin. Di heman demê de Nexweşxana Gel a Qamişlo gelek beş aktîv kirine ji bo hemû cureyên nexweşiyên koçberan û niha jî beşekî kilînkê yê niştekariyê jî tê aktîf kirin.

Di derbarê mijarê de Rêveberiya Nexweşxaneya Gel a Qamişlo Meyîsa Meter ji Rojnameya me re axivî.

**‘Me ji bo nexweşiyên koçberan beşek ji kilînkê aktîv kiriye’**

Meyîsa di destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser nexweşiyên koçberan û wiha got: “Ji xwe Nexweşxaneya Gel a Qamişlo hîna ji nûve beşên xwe temam dikir, ji ber vê yekê me hîna gelek beşên xwe amade nekiribûn. Herwiha ji ber rewşa awarte ya ku derketî holê jî gelek birîndar hatin nexweşxaneyê, lê belê me ji bo vê rewşê beşek ji birîndaran re hate amedekirin. Ji ber seqem û sermaya dijwar gelek koçber ku piraniya wan zarok û jin bûn nexweş ketin û ji bona dermankirina wan ji hemû milî ve em ketin nava liv û tevgerê û em bi wan re alîkar bûn. Di heman demê de beşek di neweşxaneyê de ji bo nexweşiyên zarok û jinan hate amedekirin.”

**‘Wê Beşek di nexweşxaneyê de girêdayî niştekariyê aktîv bibe’**

Meyîsa Meter anî ziman ku beşekî kilînkê yê niştekariyê wê aktîv bibe û wiha berdewam kir: “Niha beşekî kilînkê yê niştekariyê wê aktîv bibe ji bo rewşên awarte. Ji ber nexweşiyên koçberan gelek bûn, dermanên me kêm derketin û niha jî derman ji me re pêwistin. Herwiha dermanên ku niha li ba me tune ne jî dermanên zarokan e. Beşê me yê ku kêmasî ketiyê, yê şuştina gurçikan bû, ji ber ku hejmareke baş ji koçberan hebûn. Nexweşiyên ku niha tên bêtir nexweşiyên girîpê û nexweşiyên çermî yên dest û ling ku ji ber sermayê bi wan re derdikevin.”

**‘Gelek derman ji nexweşxaneyê kêmin’**

Meyîsa da xuyakirin ku gelek derman ji nexweşxaneyê kêmin û wiha bidawî kir: “Rewşa koçberan ji aliyê nexweşiyan ve pir zehmete, ji ber ku gelek ji wan nexweşiyên şekir, dil û çav bi wan re hene û heya ku ji destê me tê em ê alîkariya wan bikin. Dermanên ku li ba me hebûn kêmin û em astengiyan ji vî milî ve jiyan dikin. Ji xwe zehemetiyên ku di destpêkê de bi me re çêdibûn, ew bû ku hîn nexweşxane nehatibû amedekirin û gelek derman kêmin. Ji ber vê me hewilda bi gelek saziyên eleqedar û bi taybet jî heyva sor a kurd re peywendî deyînin ji bona dabînkirina dermanan ji bona nexweşxaneya gel ya Qamişlo.

**Bîra Civakê**



**Civak û Parastina Rewa**

Ehmed Hesen

Têgeha xweparastin an jî parastina rewa, parastina karanînên exlaqî û siyasî yên civakê ye. Bi derketina civakbûnê re parastin ji karekî zêdetir pêdiviyeke mirovî bû û mafdariya wê ya ji bo parastina civakê hebûna xwe heya dawiyê vekirî bû, ya rast peyva rewatiya parastinê ji pêdiviyeke civakî ya mutleq a xweparastinê hatiye û weke merceke bingehîn a domandina jiyanê hatiye dîtin. Her wiha têgeha hebûn an jî nebûnê ye. Bi wateyeke din an tu yê xwe biparêzê û bijî an jî tu yê bimirî. Ji bo tu nemirî divê tu xwe biparêzî. Li gel hemû zindiyan parastin hêmana sereke ya mayînê ye. Mirov zindiyek xwedî aqil e ku difikire û diaxive, hêza mirov ya pêşxistina zihnî heye. Bi pêşketina mirovahiyê re mirov karî hêza xwe ya fikrî û fîzîkî bi kar bîne û alavên xweparastinê ji xeteriyan pêş bixîne.

Li gorî qanûna cezayê ya şoreşa Fransayê ya 1791’an, di doza parastina rewa de qet sûc tune ye û ji ber vê yekê tu tazmînata medenî nayê hukimkirin. Di Qurban û hedîsên Pêxember Mihemed de jî banga parastina rewa tê kirin. Civak di çarçoveya parastina rewa de maf digire ku di hin şert û mercên xweparastinê de hêza xwe ya êrîşê jî bi kar bîne, da ku xeteriya tunebûnê ji xwe dûr bigire, ev yek di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de bi zelalî hate dîtin, gelê Rojava hem ji bo parastina xwe û hem jî ji bo dûrxistina xeteriya tunekirinê, dest bi paqijkirina nava xwe û derdora xwe ji êrîşan kirin û zemîneke xweparastinê dan avakirin, di heman demê de parastina xwe ya cewherî pêş xistin. Hemû şêwazên şer ên ku di çarçoveya parastina xak, hebûn, nasname û vîna civakan de tên kirin, bi awayekî mafdar dikarin bibin şerê ji bo parastinê û tu zagon an jî pîvan nikarin rê li ber bigirin. Gelê Vîetnamê li dijî kolonyalîzma Emerîkî di bin şert û mercên herî zehmet û qirker de dikarîbûn parastina xwe ji êrîşan bikin û di encamê de bi ser bikevin. Ji ber ku li holê ne tenê şer hebû, lê belê rêxistinbûna gel a li gorî pîvana şerê gel ê şoreşgerî û parastina rewa hebû. Mirov dikare vê rêbazê di nava tax, kolan, bajar û gundan de bi rihetî esas bigire û bike rêbazeke şerê ji bo hebûnê. Di heman demê de aboriya komînal û hevbeş a gelekî dikare şêwazên xweparastinê di aliyên lojîstîkî de zêdetir xurtir bike. Ji ber ku ger aboriya civakî li ser rayedar an aliyekî din ê sîstemê yan dewletdariyê be, ew aborî xweseriya xwe naparêze û dikare di çi kêliyeke ne diyar de were qutkirin, lewma jî hem di aliyê aborî, hem leşkerî, hem amadekariyên derûnî û lojîstîk de divê parastina rewa were amadekirin. Civak dikare bi hemû beşên xwe yên ciwan, temenmezin, jinên ciwan û jinan bi rihê seferberiya ji bo xweparastinê parastina xwe ya rewa li dijî şêwazên êrîşên qirkirinê bimeşîne û derbe li dijmin bide, ya ku zêdetir di parastina rewa de divê were bingehgirtin xurtkirina rihê serkeftinê ya ji beriya şer e.

Di serdema me ya heyî de, gelek caran parasatin ne tenê bi rakirina çek e tê kirin, lê belê bi rêya pênûs, mejî û fikirî jî parastin tê kirin. Li vir em dikarin behsa şoreşa Mahatma Gandî bikin, ku mînaka herî mezin a wê yekê ye, dema ku Hindistanê ji bindestiya Îngilîstanê ya ku Hindistan du sedsalan dagir kiribû, bi hêza zanist û siyasetê xwe rizgar bike. Ne tenê rakirina çek rêbazê parastinê ye, lê belê divê mekanîzmeyeke yekgirtî hebe.